

zîlan,
agir
û
stranên jiyanê

helbest

medenî ferho



Enstituya Kurdî Ya Brukselê



weşanên pêrî

medenî ferho

Zîlan, Agir

û

stranên jiyane

helbest

medenî ferho

Zîlan,
Agir
Û

Stranên Jîyanê

helbest

Weşanên Enstituya Kurdî Ya Brukselê ☆ Weşanên Pêrî

Weşanên Enstituya Kurdî Ya Brukselê
û
Weşanên Pêrî

Çapa yekem 1999 Stenbol

Çap: Kayhan Matbası

Cilt: Yalçın Mucellit

D 1999 5799 25

1999 Publ. Nr. 25

Wêneya bergê: REBWAR

Weşanên Pêrî

Gureba Hüseyin Ağa Mah.

Dağarcık Sok.

Sultan Mehmet Han.

No: 32/26 **Fatih/İstanbul**

Tel-Fax: (0.212) 621 32 21

Copyright

Enstituya Kurdî ya Brukselê

Rue Bonneelsstraat

16 - 1210 **Brussel-Bruxelles**

Belgium

Tel. 00 32 2 230 89 30,

Fax. 00 32 2 231 00 97

Bank Nr. 001 - 2068530 - 81

D 1997 5799 12

Zîlan

*weke hêviyeke mezin e Zîlan
li ber min mîna destek gulên baxê îrem
di nava kenekî de strana jiyane dibêje*

STRANA NÎVRÊ

I/

Cara yekem

Sala 1987 an

Di nava awazên kalejineke dengbêj de

Û kelhoşkiya Zivistanî

Li ser qeşa dibin cûzanê bayê kur de

Dema Kafûra Bagokê dest pê kir

Di nava olana newal û mesîlan de

Mane bi tenê

Ez

Bedena teqiyayî

Û strana li ser lêvên Ayten

Û 21 yek can

21 dil

Bi 21 awazên pîroz re

Mişemir mayî

Bi hesreteke birîndar

Dinaliyan

Dergûşa ne hejandî

Zaroka bê şîr

Û sûravka mêrkuj

Di nava pûnga xenîqoyî de

Singe-sîra jiyane dilerizand

Li ber dîwarekî kevnare

Serma girtî

Di nava xêzikên bi armanca bîranîna te

Bi diljeniyeyeke polayî hatine nivîsandin

Min

Pêşî bi wan gotinên keskûnî tu nas kirî

Bi qîreke têr heydênî

Ji bo kulîlka evînê

Ji bo hêviya paşerojan

Ji bo berxika salê

Ku digot emê jiyane biguherin

Ku zarok di nava helezê de bileyizin

Bi navtêdanê gulîsora jiyane

Pesindariya te dikir

II/

Xortekî pozberanî
Keçeke karxezalî
Bi rextên çeprast
Bi rengên rojê barkirî
Di nava tûreşkan de dimeşîyan
Hingî
Min ji serê diyarê Şêxanê
Wargehê Pîr û Qewalan
Hemberî çavkaniya zordestiya teresbavan
Û kûlîna xiyaneta sedsalan
Ku ber bi hêlîna evînê destdirêjîyan dîkin
Banga hawarê kir
Min
Morîk û hêstir
Fîşke fîşka zarokan
Gotinên strana nîvre
Ber hev kirin
Bi awireke melûl
Rahişte biskên hinekirî
Guliyên hunayî
Ku di bestika çavên bi kilê siphani
Meyxûr bûbûn
Li ser pirtûka ne nivîsî danî

Evîneke bê govend dest pê kir
Bê saz
Bê sazband
Neya dilê min
Strana evîna te fûrand
Çûkê li ser pelê dara dilan
Bi ah-û zarî dilorand
Digot rabin
Ha haaa haaa gidî
Gidî gidiano rabin
Karwanê azadiyê meşîya
Hawar daket
Rabin

III/

Min

Tu bi gotinên strana li ser lêvên keçika nû gihayî

Bi gulbijêrkên hesretê

Têhnika germahiya evîna welatê min

Welatê di nava bêzarî û bêçariyê de

Tenê, parçe kirî

Kevir û kûç şikestî

Çiya, dar û devî sotî kirî

Melûl

Di nava xewneke azadiyê de hejar

Nû nû dipijkivin nas kirî

Ew strana bi gotinên şikestî hatine hunandin

Û keser

Û ahên

Di bin qundaxên tivingên kemalî de dinalîn

Car din

Bi dil û gurçikên parçe kirî

Bi zinarên teqiyayî re

Bi mozoliyan canbêzarî re diqîriyan

Digotin: Emê ji nûjen de rabin

Rabin û keviran biguherin

Axê biguherin

Xewnên xemgînî

Reşka çavên evîne biguherin

Berê ava li herik ji nûjen de

Di nava xemla azadiyê de

Ber bi şikeftên ku cengawerê gelê min

Di wan de xwe vedişêrin biguherin

Stêrikên asûmanan

Li ser baskên Kevokan deynin

Rojê

Li ser kefa mista xwe deynin

Hingî

Ezê gotinên di nava cewherê ahenpûşî de

Bi haveynê baweriyeke şoreşgerî stewihayî

Bi sitirihim

Gotinên ji ber helbestvanê demê mayî

Mîna bizrikê kulîlkên hêviyê bi lorînim

Û strana nîvrê

Ku li ser lêvên te mayî

Temam bikim

IV/

Mirina kirêt
Ku di nava xeftanê xiyaretê de
Bi keskûniyeke bê wate
Hat
Di nava bêşermiyeke aşûfte de
Li devê deriyê me rûnişt
Kesî sunda rizgariyê
Heydêniya ciwanîka kûmeyt ya şahbazî
Ji bîr nekir
Şalûl û Bilbilên welatê parçe kirî
Di nava xwînê de razayî
Birîndar
Ku bi şev û roj
Di nava refên xortan de
Basimbara azadiyê dilorandin
Ji bîr nekir

Girtin
Êşkence
Koçberî
Û mirin
Zêde dibû
Xiyaret kûr dibû
Midyard nafûra hawarê bû
Bizrê xiyaretê mezin dibû
Amed diweliya
Dêrsim dihejiya
Mêrdîn dikeliya
Xencera kemîna dereng mayî
Li ser xafika azadîxwaziyê rûdinişt
Dem tirsonek
Mirov bizdonek
Û kes
Li gorîstanên kêl şikestî xwedî demediket
Ne got ez pesindariya jiyane me
Ne got ez bi dilsoziya azadiyê
Û dara tuwa li devê dergehê hewşê
Bexika min î virnî
Û zaroka min î di pêçekê de
Wê tevna jiyaneke nû lidarbixin

Zaroka mêşmirî
Dara tuwa qeliştî
Û berxika bêxwedî
Di nava kirasê hevrişmê dilan de
Di nava tevzînokên herhilî de pelixî
Qersifi
Melûl dinalin

Û ez
Û 21 pelê ewran
Û zaroka di pêçekê de
Û 21 yek stêrik
Û dayika dilojarê digot
Û 21 ciwanik
Û 21 teqînên toza kîmyewî
Û Çiyayê Bagokê
Û karxezalên meqûşî
Û lîle-lîla jinên Nisêbînê
Di nava nafûr û kafûra sedsala bîstan de
Ketin
Û ranebûn

Dilwêranim dayê

V/

Cara yekem

Min

Di nava rûpelên pirtûka cangoriyê bê nav de

Ku bergê wê

Bi rengên çavan

Bi neqşa dîroka nezanînê

Birçî, tî

Hatiye xemilandin

Jînenîgariya te xwend

Û strana nîvrê

Ku li ser xîreta jiyane ditewirand

Bi diljeniyêke têr tevzînok

Lorand

Hingî min tu nas kirî

Bi sundeke mezin

Bi evîndariyêke bê hember

Digot: Emê rengê stêrikên sedsala bîstûyêkê

Biguherin

Li ser pelê darên sala gonê

Ku li ber hebûnekê

Bi dîlaneke şexanî dilerizîn

Bêyî ku mirinek bi ser me de pêl bibe

Bêyî ku tirseke çipil-tazî bi ser me de bixurre

Emê regekî din

Xemleke din bi bijêrin

Mequşî

Çeleng

Beşik û ling xirxalî

Poz xizemî

Kumeyt û şahbaz

Ku di nava wê de

Keziyên sor î sosinî

Simbêlên reş î qeytanî

Bi bisk û temporîka evîne hatiye hunandin

Û bêjin

Eve bûka jiyane

Sunda te ya azadiyê

Bi keskûniyêke canfedayî

Li ser lêvên min in

Bi nas kirina te, min xwe nas kir
Ey cengaweriya min
Bawerî
Û gotin ji bîr nabin
Bo dilopên ava jiyane qut nebin
Katika nû pişkivî neyê qurmiçandin
Firşik
Haveyn
Û bizrikê rûmetê
Û tovê xîretê
Di nava tirşokê fetsînokî de welî nebe
Rê û şivîleyên xelasiyê kor nebin
Û hemberî xwedayên bi xwîne mezin dibin
Nebin tacîdarê jiyane
Bo xewnên hevbeş
Ku min û te bi hev re didîtin

Bi şelpanî bi herikin
Bo di demeke nêzîk de jîndar bibe
Sunda te
Ku bi evîna dilojarêya azadiyê
Mîna ahenpûşiyê hemdemî
Dilê mirovaniyê bipêçe
Sunda mala Zalê
Yan jî
-Bi dîlzêrîniya xelata erdê
Ax û erd û av
Û çavkaniyên kûlmoza zift û neftê
Navê Kurdistanê
Û xwîna cangoriyan
Bi evîneke şahbaz
Û dilsoz
Dubare bibe

Bo careke din
Lorîna min î bê guneh
Bo careke din
Hêstirên min î bê zîyan
Û berxika min î tenê
Zaroka di dergûşê de
Ne kujin

VI/

Dengê stranekê tê guhên min
Dengê nalêneke dîlanî
Girêkên birîndariya xedar
Zincîrên keliha dîlzariyê
Dihilweşîne
Şeqîna kenê zarokan
Li devê pacê
Bi dengekî mizgînî tê guhên min
Dengekî nas
Û nêzîk
Dengê dil tê
Dengê dilê jiyana avis
Li ber zayinê
Dengê zarokê
Û qîrêna dayika nû pêketî
Xuşêna avê
Lerizandina pelê ber bi ba dibe
Dengê dewseke nû
Û têhnika germ
Ku bi firşikê jiyane haveyn girtiye
Li ber derî
Teq-reqa dergûşê
Dengê tê guhên min
Destên li ser qundaxê gulbijêrkan darve dikin
Li gastîna ber derî
Tu dibihîze hevala Delal
Lokman, Harun, Çekdar
Mizgîn, Zelal, Stêrk
Azad, Rizgar, Bahoz
Hun dibihîzin
Hun dibihîzin
Xulîna
Dengê mizgîniya azadiyê

ZÎLAN

I/

Mistek ax

Reşika çavên min di nava avê de xeniqî

Li welatekî biyanî

Di odeyekê de

Bi tenê

Kelogirî

Dilşikestî

Minê ji bo te qîrek bidaye

Û piştîre bi taqê xaniyê li ber çiqliyên dareke ku hîna

navê wê nizanîm

Ku nifşê wê nas nakim û min heya îro ne dîtiye

Ji nava refên daristanên Hindistanê

Di dinava çûwal û rekihên metîngiriyê de anîne

Di nava axeke ku ne zimanê wê dizane

Ne bêhna hewa wê nas dike çandine

Mîna min bi tenê

Bi zincîreke têr xelekî girêdayî

Hemberî cîhana ku di nava berjwendiyên xemgînî de

Zexel, kor û kerrende bûye

Cîhaneke birçî ku dengê awaza te nekîr Zîlan

Minê ji bo te çend stran bigotane

Lê dengê min ketiye

Zimanê min şikestiye

Minê helbesteke ku çavkaniya wê ji nava kanîzerkan

Ji nava dibistanên gulbijêrkan nivîsandiba ye

Qelema min tengezar e Zîlan

Hemberî awaza te

Hemberî diljeniya te ya têr evînî

Lewaz û qersifi dimîne

Niha

Zarokên Kurdistanê

Ku bê dibistan in

Kevir û kûçan, lat û zinaran boyax dikin

Li ser bergên daran navê te dinivîsin Zîlan

Hevalên te
 Di têlsiza fermandarê Botanê de
 Digotin: Ji bo Zîlan mezin dibin zarok
 Tiving ji bo Zîlan şînikê dîkin
 Pirpirîkên çiyarêzên Kurdistanê
 Ji bo Zîlan difirin
 Şalûl û Bilbilên ku hêlînê wan wêran bûne
 Ji bo Zîlan dîlokên dibêjin
 Û gundê sotîkirî teva
 Bi hêydênîyeke azadiyê ji bo Zîlan ava dibin
 Karwanên ku dîrokê di xurcezînên xwe de bi cih dîkin
 Ji bo Zîlan bi rê dikevin
 Bûkên salê
 Zavayên demê
 Bi dahol û zîmê
 Û Mala Îsayê Kinê bi Kemançê
 Ji bo Zîlan dîlanê girêdidin
 Nûçevanê rojnamê
 Spîkerê telewîzyona MED
 Û bilûra Serhanê Mala Usifê Xelo
 Cengawerê li gastiya Goristana Xalbûbê
 Ku kemîn li pêşîya dijmin daniye
 Ji bo Zîlan dîlorînin
 Ez û oda bi tenê
 Bi helbesta xwe re
 Bi hesreta mistek axa Şewlê Beglayê
 Bi hesreta qurtek ava Çala Heqlo
 Bi dilekî têr hêvî bi gotinên şelîpanî
 Destanekê dinivîsim Zîlan

Dengê min ketiye
 Gavên min
 Mîna dilê min di nava xewneke dûrketî de şikestî
 Awira min qels e
 Car din
 Car din xwe dispêrime navê te Zîlan
 Ê her sê zarokên min
 Lalêş û Sîfî û Sînem
 Bi her du teliyên serketinê
 Bi ramûsanên zarokî navê te bang dikin
 Sêveke Xelatî
 Sor î sosinî
 Xeftanekî rengîn li bejna te dikin
 Daw û delingên xeftanê keskesorûzer
 Bi straneke hawarî
 Dibe al û ber bi ba dibe
 Ji Dêrsimê ber bi Bagokê diherike
 Bi kenekî dengvedana avê
 Horên û hêlana dijmin dikuje
 Dimirim ez
 Dimirim
 Bi tenê
 Winda
 Li wargehekî biyanî
 Ji bo kulîlka sor
 Ji bo pelê zer î mişemir
 Razayî
 Dizanim ku niha gorîstanên welatê min
 Di nava şînê de dikelin
 Stêrikên asûmanê welatê min difûrin
 Dizanim ku niha çiyarêzên welatê min
 Di nava berziya hevalên te de diqîrin
 Ê şahbazekî hespan hemberî gora te dihire
 Zîlan
 Tu dizane ku mizgeftên gundên me
 Bê bang
 Naqosên dêrên me bê çingênî mane
 Hesret di nava xewneke giran de razayî ye
 Ê hêvî maye dengên hevalên te
 Ku li ser mermeran helbestan dinivîsin

Li ser herka avê ji nûjen de jiyane ava dikan
Şev di nava girî de
Roj di nava hêviyê de
Dixeniqe

Ne Îsayê demê radibe
Ne duwazdeh şagirtiyên bazdayî xuya dikan
Xwîn diherike
Xwedayên reşê ji xwîne têr nabin
Ez dimirim Zîlan
Ez dimirim
Li ber çemê mirinê perîşan
Li ber şaristaniya zorê bêçare
Û hîna hinek kesên şermezar
Misk û embera dilan kurmî dikan
Û hinek kesên di nava buxza kevneşopiyê de razayî
Çavên reşbelek î di nava kilê siphani de nabînin
Dizanim ku ranaweste awaza xemrevîna min
Dizanim Zîlan
Valahiyeke mezin û bi tenê
Digirî
Mirinê xefk vedaye
Xiyaneta dilkurmî kemîn daniye
Car din Zîlan
Perengên tifika vemirandî diçirisînin
Car din
Ji bîrkirineke mezin
Dûrketineke tirsonek peyda bûye
Duman, toz û bixûra demsala Biharî
Bi ser devê tivinga şazîberno de
Bi cengaweriyeke destanî
Wilo mişemir
Pêl dide
Xiyanet car din
Pesnê xwe dide
Xencera xiyanetê
Şûrê bê xîretiyê car din
Li Kurdistanê qîran dide

Dixwazim Zîlan
Û ez dixwazim ku gotineke efsûnî
Straneke têr xewnên di nava hêviyê de pêçayî
Û leylaneke evînê bilorînim
Ji ber ku şarîstanên welat
Zarokên bi holê dileyizin
Jinên guliyê jarê dihejînin
Kevokên bedestanên vala
Bi dengekî xenîqoyî
Qehrok
Kîndar
Evîna te dilorînin
Kelekên bê ziman
Bedenên bi kevirên reş î dîrokî hatine pêçan
Sikakên vala û nûmayişên girseyî
Li duv te dimeşin Zîlan
Dema navê te tê gotin
Çavên karxezafî
Biskên hinekirî di nava heydêniyeke hawarî de
Bi xalvedaneke cewherî bang dikin
Dilopên hêstirên ahênzarî Zîlan
Navê te li ser kulîlk û gulbijêrkan dinivîse

Kurdistan navê te
Dîqîre

Zîlan
Min dixwest
Min dixwest weke zengilê saeta lidarxisti
Weke pelê bi bayê Xerbî re dilerize
Weke têla tembûra Biraderê Dêrikî
Bi lêvên lerizî
Çavên te jî av
Dilekî evîndarî strana te bêjim

Kanî ew hêz
Kanî ew berzî
Ku dikaribe dilovaniya te
Di nava dilxwaziya maşoqî de bilorîne
Demsal dizîvirin
Haletên cotbariyê car din di nava rewa erdê de
Ji bo nêrgizên salê dimeşin
Şivan û bêrîvanên welatê min car din
Ji bo maxmûriyê birevînin dengê xwe didêrin
Û gula sor î sosinî
Di destê zaroka ne tepte de
Di nava xeftanê bayê bi bêhna nefelê bar kirî
Pêçayî
Bi evîneke cawîdanî tînine ji te re
Gula sor î sosinî
Di nava misk û ambera helbestan de
Di nava xemla rengên rojê de pêçayî
Di destên bûka salê de
Tînine ji te re
Û ez
Bi helbesteke dilhejarî
Ku bi pîroziya ava kewserê hatiye avdan
Û ez
Bi straneke ku bi xemla zilfa-yarê û dengê neyê pêçayî
Têr hêvî
Tînim ji te re

II/

Hîna min ne gotiye.
Min hîna gotina xwe
Leylana evîna xwe ne gotiye
Di nava jiyaneke bizdonek
Û hesreteke di nava xewnên tirsê de pêçayî
Strana loyî loyî dilorînîm
Min evîn kevin kir Zîlan
Dîrok
Coxrafya
Astarzaniya min ku bi ked û xwehdan
Bi çîlekêşîya sedsalan hatibû ber hev kirin
Temam ne kiriye
Bendeyî gotineke te
Bendeyî straneke te
Westihayî
Di nava livîna diljeniya êş û derdan de
Derdên bê derman
Hîna çareser nebûne
Û bendeyî kenê serfiraziyê ne
Û helbest
Û gotina loyî loyî
Erê, bi Êlim loyî loyî
Erê, bi Êzîd loyî loyî
Erê, bi Mihemed loyî loyî
Erê, bi Isayê Nûranî loyî loyî
Û bi xidirilleza li ser dilê evîna min û te loyî loyî
Ez neweyiyan nakim Zîlan
Ku min dîrok kevin kir
Ku min alfabe kevin kir
Bêyî ku ez strana te
Strana nîvrê maye tamam bikim
Li ber taqê dîwarê roja gonê
Di nava gulbijêrkan de
Bi heydêniyeke metafîzîkî
Banga te hîna li ser lêvên min in

Sar
 Di nava zemheriyê de
 Hişk
 Bi ava kûra hesinkerê Midyadê avdayî
 Bi çûkan re di nava valahiyeke mezin de
 Bi barana stranên xort û dotan re
 Ku kes nikare bibêje kanî li kûderê ne
 Vê sedsala ku rezîlî û bê xîretî di nava cestên bizmarî de
 Bi keşkûliyeke revok hatiye ristin
 Li gorî amûreke kevnare de dilorîne bêjim
 Teqîna afûra roja gonê
 Li ser bedena kafûra dijmin danî
 Wê rojê
 Wê rojê ji nûjen da kat da pişkoka dilan
 Kulîlkan vekir
 Bilbizêkên jiyaneke nû
 Li ser bedena xîretê reng veda
 Mîna okyanûseke sextiyani
 Mîna roja Temuz û Tebaxê
 Di şaneşîna dilên dost û yaran de
 Bi evîneke xalvedanî rûnişt
 Her tişt ji dengên Agirî mezintir
 Her tişt
 Ji nanê destê zarokên pêxwas
 Ji hêstirên dayikên bêmecal
 Mezintir difûriya
 Ew mezinahî
 Ew dengên li ser dilan diliviyên
 Jiyana bi maşoqiya nûjeniyê re dikeniya
 Bi awaza te re dililiya
 Hingî min got
 Bi stranên dot û xortan re
 Ku ji serê çiyarêzên Kurdistanê
 Ji deşt û newalên axa narîn û nazenîn olan didan
 Min hingî di nava mercanan de navê evîna xwe got
 Roja gonê ku barûd
 Û xwîn di nava evîna dil de şîqiya
 Hingî min got
 Bi gotinên ji nava agirê goristana Hexê Bêsa
 Bi destên zarokan hatî berhev kirin
 Min navê te got

Min navê te got Zîlan
Hemberî balafirên nikil tûjik
Ku bi ser zarokên pêçekê de
Bi ser kalên heştê salî de
Kafûra mirinê dibarînin
Ku min xwe kevin kir
Ku min dîrok kevin kir
Û mirovanî tovê waweylê ye

Xwîna zarokan
Berên di bedena kalê heştê salê de
Di nava dilojarêya dayikan de hîna
Hîna li sikakan diherike
Zîlan
Piştî roja gonê
Wê afûra mezin
Tirs reviya
Xwîntewrêneka babexîlkê
Di nava kefenê êşa tewanbariyê de
Fetisî
Mirin koçber bû
Generalên mûr şikestî
Li ser wêraniya çar hezar gund dikeniyar
Li ser Kurdîstana birîndan amadekarî dikirin
Mirin
Wêranî
Sotîkirin
Qirkirin saz dikirin

Piştî ku te
Bi evîneke bê hember navê azadiyê hilda
Pesinê cengawerîya ku hîna generalan navê wê ne bihîstî

qîriya

Dîtin
Û Mûr şikestî rûniştin

Roja gonê
 Ku te bi strana evînê dîlan girt
 Dîtin
 Ku ji her malekê parçek pola
 Parçek dilê ahenî derket
 Ji bedena zarokên parçekirî li meydana cengê amade bûn
 Mozoliyekê xurrên kir
 Ê zaroka bûyî
 Bi navê te
 Bi lorîna evîna te mezin bû
 Rastî dîtin
 Dîtin ku zarokên bi navê te
 Hatin
 Bi çavên maşoqî
 Bûne barûd
 Bûna agir
 Bûne fişek
 Bûne hêvî û teqiyân
 Ê hatin
 Mîna kevokên xalvedanê
 Helbestên ku her gotin kulîlk bû
 Her gotin gulbijêrk bû
 Dirêjî jiyânê kirin
 Ku bazirganên cîhanê bi yek devî digotin
 Gotinên helbestan kulîlkan venakin
 Ku digotin
 Gotinên helbestan evînê av nadin
 Ku digotin
 Gotinên helbestan pelên hêviyê venakin
 Hemberî te şermezar bûn Zîlan
 Wolkanek teqiya wê rojê
 Di kûraya newala zerzemîn de
 Asûmanê dilê generalan wêran kir Zîlan
 Were bibîne
 Di ser dilê xiyaretê de bê çawa
 Were binêre
 Di ser dilê zordestiyê de bê çawa
 Bi heydêniyeke tofanî teqiya

Îcar ezê

Li ser xwîn-rewaniya gundan

Li jiyana teng kirî, termisandî û bê fesal mayî de

Û keşkûliya jiyane

Îcar ezê

Li ser bedena zarokan

Li ser bedana xort û kalan

Li ser pîne û riqayên li pîlaxên guhê bajaran

Û perîşaniya mirovaniyê

Îcar ezê

Li ser evîna xwe

Li ser maşoqiya xwe

Li ser çîroka birîndar

Û bêzariya mizgeft û dêran

Îcar ezê

Li ser evîna te Zîlan

Li ser bejnûbala gerdengaza delala cîhanê

Û mixabîniya tengezariya stranan

Bi zulfî yarî bêjim

Û tenê

Gotin û hêza ku dikarim ji bo te bêjim

Her ez im

EVÎNA TE XELATEK DA MIN

Evîna te xelatek da min, pîroziyek
Wek hêviyê û bêhna piştî baranê ne bi tuwî
Ku bi fûrandineke kelo-germî mirov dipêçe
Şiyar bû şev, şiyar bû çolistana dilên kevnare
Dema kulîlkên hêviyê li serê çiyarêzan rengvedan
Bi awazêke birîndar ku di nava daristanan de difûriya
Min bang dikir ku xwînê rawestînin
Min hêvî dikir ku birîndariya min derman bibe

Gunehklariya çî bû li ser min û dilê evîna min rûdinişt
Hîna nizanîm ku sergomiya min û evîna min çima hewqasî dirêj kir

Ez, di nava kîşwera kevnare de
Ez, di nava kîşwera westiyayî de, li welatekî ji bîr kirî
Ku bi melûliya bê dadgeh di nava rekiha hesinî de dipûniye
Talan kirî, birîndar dinalim
Nexşeyên di nava rengên dilojarê de hejar
Bi taqêneke hejar bi dîwaran ve bizmar kirî ne
Ji dilovaniya evînê dûr
Navê şaristanî û mirovaniyê di nava mistek ax de fetisandî hiştine

Û şermezariya welatekî xeydok ku xwîn diherike
Û hîna çem û bestikên dilê coxrafya min bêrm û golan nabînin

Ku hîna, di nava gotinên helbestvanekî kal de navê min
Di nava awaza dengbêjekî payebilind de navê welatê min
Cih ne girtiye û hekîmekî dermanê birîndariya zarokatiya evîna min
Ku hîna şîrê germik di sîngûberê wê de ne liviyaye derman ne kiriye
Gelo çima, gelo çima
Birîna xortaniya min ku di nava tirseke bê nav de tengezar maye
Hewqasî bi xwînê şah dibe

Liqaşî ba û bablîsokan, liqaşî stêrikan û gotinan min dixwest
Stranên evîna xortên li çiyarêzan ref bi ref xwe vedişêrin bêjim

Ez û tu bi tenê; ez û ji bîr kirina ku bi teqîna roja gonê
Hemberî dilsariya neqam, xenîqoyî
Di ser çiyarêzên Şimexê re fişek teqîya, hingî min
Di nava tenêbûneke piştî baranê, dilê xwe danî ber kaba te
Gelo çima, gelo çima
Dem û dewranên di nava ava malzaroka axê de
Bi evîneke mezin di parzemîna dilê min î parçe kirî de
Û li ber singotaq'ên romiyan de bêzar mane

Şerm dike cîhan, hemberî awaza komên xelkê şerm dike gerdûn
Ku şev di nava xeftanê mirinê de evîna min difetisîne

Xelatek da min evîna te, xelatek bi biskên porê xemilandî
Di nava hêviyeke ku bi xwînê hatiye avdan û hîna têhnika hîvê
Hemberî celladên demê, mîna şelîteke çardarê dirêj ne kiriye
Hêviyê şahdamarê xiyaretê, evîne baskên zordestiyê şikandin
Û min keziyên di nava stranên demê de, di nava gotinên helbestê de
Bi xweliya dîrokê ku di nava xeşîmên winda de haveyn kirin
Kaniyên di kûraya erdê de derxistin û min
Bi ramûsanekê navê te, bi baweriyekê evîna te nivîsî

NAYIF NAYIF

I/

Nayif Nayif

Ahên

Kul û keserên dîrokî ji nava kaviîlên rekih kirî
derketin

Qersifî

Şikestî

Û di nava ava heft lehiyan de poz firkanî hatin

Gotinên di nava şimadanê de pêçayî

Meqamekî bê wate dilorandin

Zingara dilan ku mil sipartine demsalan

Wilo hêsanî li ser dilê mermeran nehatine neqîş kirin

Gotinên di nava bircikên hişkeber de melisî

D'bûne 'leb-şêrîna' ser zimanan

Nayif Nayif

Beşek ji dîrokê xiyaneta mîrate ye

Tovê waweylê dijenê Nayif

Qotik

Û êşa sil di nava hev de pêçayî

Payîzokên serserî

Ku ji ber hêlan û melûliya dilovaniyê reviyane

Di ber şîbaqa teyroka çirîzokî de wêran bûne hey gidî

Axîn

Û dilojarêya li ber destaran

Weke ku hozanek di birîna reş de binale û bêje

Xortaniya di nava germika dil de

Bi fermana padîşahan dihate tefandin

Û Şahmaran bi xencera xiyanetê

Li cihê ku dar di nava xwînê de

Xwehdan di nava zilmê de

Dil di nava kul û keseran de

Evîn di nava mirina bêdeng de

Dihate kuştin

Peyam û ayat
Ayîn û tewaf
Mishef û Tewrat
Nemaz û niyaz
Bûne şûr û mertalên bi navê Yezdanê mehreban
û ketin pêşîra me
Bûne rim
Bûne tîr û kevanên bi navê Xwedanê şev û rojê
û hatin hemberî me

Mirin
Û hejarî weke xeftanekî tacîdariyê
Xwîn û koçberî weke mizgîniyeke behîştê danîne ber mirovaniyê
Û xulîna dûr kirina ji nav û pesindariya rastiyê gotin

(Yezadanî pak
Ku di her peyama û gotinên xwe ya şêfîn
Ku li ser pelê zimanan hatine neqîş kirin de
Bextê xwe daye mirovan, get dengê xwe ne kir, qet)

Siya zarokan di nava bergên pîroz de şikestî
Nameyên hozan û evîndaran
Bi ahêneke li ser minberam
Û qesîdeyên bi awazên bilind dihatin xwendin
Dipelixîn
Şûr
Û tîrpêjên bazirganiyê
Dihatin
Li ser mikewniya min konên xwe vedikirin
Û şev dikete kûraya jiyane
Her tişt di nava windahiyeke berbangê
Bi ber û şarapnêlan dihate parçe kirin
Her tişt bi nûçeyêke bê dem
Di nava dilsariyeke gotinan de pêçayî
Dihate guhên min

Nayif Nayif
Tenê awaza dilê dengbêjan ji bîr nabe
Û navên cangoriyên welatê min

II/

Nayif Nayif

Dubare dibe mizgînî û hawar

Cengaweriya dîrokî ku di nava efsanan de perçiqî

Cîhana bêdeng dihejîne

Û xwedayên di nava pîkola hespên sed sala bîstan de

Radibine şipê

Ajansên rojê bi xwînê av didin ragihandinên xwe

Nûçe di nava rûpelên rojnameyan de digirîn

Kes dengê helbestvanên berbangê

Ku dibêjin

-Paşiya me ferman e pêşiya me ceng e

Û dengê kewê derengmayî

Na bihîze

Û çîrokên welatê min nayên gotin

Nayif Nayif

Dostên demên berê ku barûd û nefta dibin erdê de

Bi pîvaneke xapînokî dixistin xurcezînên xwe

Bi hezaran kulîlkên çiyayên Kurdistanê ditefandin

Çavkaniyên mirovaniyê

Gotinên ciwamêrî

Û mista bi germika xwehdana evînê avdayî

Di kûraya ziha maran de rûniştiye

Nayif Nayif

Gêsinê di kûraya malzaroka erdê de çikihayî

Û kewna demsalê

Bi mirinên têr êşkence

Bi wêraniyên derfehatî

Kaf û kûn bûne

Û hîna Nayif

Navê min bi helbestvaniya welatê min nehatiye nas kirin

Û çîrokên welatê min

Li ber bestikên bê av

Razayî ne

(Jiyan çima gelo

Hewqasî zilindarî kirine?)

III/

Nayif Nayif

Mirin evîndariya renegekî bê hember e
Car din di gotina min de êşek heyê
Kesereke bê derman
Ku zarok li xerîbiyê mezin dibin
Ku zarok di nava reşeke şermezar de dileyizin
Bi bîranîneke westiyayî
Hey gidî
Navê mirinê çiqasî giran e

(Mirina bê dem

Navê tewanbariyê diqîre)

Nayif Nayif

Dibêjim ku di nava gotinên min de êşek heyê
Di nava strana demê de poşmaniyek
Dibêjim ku birînek heyê
Di nava gotinên evînê de dinale
Axînek
Û bédengiya di nava tirsê de razayî
Dibêjim ku di nava helbesta demê de
Di ristina gotin û hevokan de
Şermezariyek heyê

Nayif Nayif

Navê mirinê çiqasî giran e

IV/

Nayif Nayif

Di kêlîka awaza têkçuyî de

Gelo berê

Demsala di nava xwînê de melûl dibe

Ku pesin

Ku ciwamêrî her û her bûye çavkaniya dengbêjan

Û xûlîna dilwêranî

Bêyî ku bager û xapînokên zarokî di nava jiyane de bilivin

Dikarin gelo

Gelo wê dikaribin strana te û hevalên te bêjin

Gelo wê dikaribin

Mîna dezgîraneke derengmayî

Mîna şelq û pêlên xumêna Derya Wanê

Mîna avzêmka dilên daxdayî

Bi dileşewêtiyeke neqam, bi dîlfûrêneke tolhildanî

Êrîş bikin ser xiyane

Nayif Nayif

Kafûra Roma Reş

Bi kefzêya zelîqonkî ku balafir bi ser me de direşînin

Di nava lêv û diranên hefrîtên deryayî de bêhnê li me diçikînin

Kuştin

Wêranî

Sotî kirin

Têra wan nake û têhna wan na şike

Na şike

Her dem ji berga çolîstanên xalî stranek difûre

Car din dîrok ji bargiraniya marmarotkan xelas nabe

Lêbelê car din Nayif

Meş û herka refên cengawerên welatê min

Ku ber bi ronahiyeke geş merş û stranan dibêjin û dimeşin

Hêlana cejna dilan dilorînin

Gelo kulîlk

Gelo strîzerk

Gelo peşkên baranê

Gelo sîwana dergehê oda Tripespiyê

Gelo kul û kesera dilê Mamê Birahîm

Gelo Firça Bahram

Gelo stranên Ciwan û rengê hinarên radîşo

Gelo dengê kewê çîr ku li ser tibarekan dixumxumîne

Çima hewqasî di nava melûliyekê de dinalin

V/

Hîna salvegera bîstîpêncan nehatiye pîroz kirin

Û kopirê Bagokê têr kulîlk ne bûye

Û banga bîstûyek ciwanikî

Û evîna min

Bersiv ne dîtiye

Nayif Nayif

Ecemê bi dengekî dilpelişî dilorîne

Ax şewitî

Av şermok diherike

Û çûkên di nava spîndarên Cerihê de

Hawara Seîd Axayê Dekorî

Û waweylê ya Eleqemşê

Bi gorîstana Dugira bêdeng re

Bi hêstir û lorandina delala Ecemê re

Ku li ser dilê min birîneke şêrîn e

Bi melûliyeke bê derman dilorîne

Gundên sotîkirî hîna kelogirî

Mişemir û tenê

Awireke şikestî bela dikin

Hew dizanin çi bikin

Nayif Nayif

Deşt û newal bi navê te

Avzêmkên veşartî

Zinar

Û mesîlên di nava bombardumana bê rawestandî de westiyayî

Çiyayên Kurdistanê bi navê hevalên te têne bi nav kirin

Mîna hêviyeke ne şikestî

Mîna evîneke dibin sîwana rimê de ne pelixî

Bi pel û weşiyên gulîsoran re dipişkive

VI/

Nayif Nayif

Dengek tê min

Di nava dîrokê de, dengekî bêhn birihayî

Tu dizane ku gavên şikestî nayên hejmartin

Gotinên ne tamamkirî

Û beza niv rê

Û qonaxa bê rêwingî

(Roja gonê Nayif...

Dema xanûmanên maqultiya mirovaniyê

Tewlên bê hesp...

Ode û heywanên bi bircik

bê çîrok û destanên pesindarî mişemir hiştin

misk û embera dilan wêran bû

Ewrên di nava baranê de xeniqî

Û şeqîna ferîştehan nehate guhên me)

Mozoliyan em kuştin

Girtin û koçberiya ku bi tov û bizrikên xiyaretê

Bi hesreta yekîtiyê û pel û mêweyên dibin piyan de mayî

Û berê topan

Û toza renga zereve em biraştin

Gotin

Û stranên di nava agirê demê de şewitî

Û helbestên parçe kirî

Şun me de rêz bûn Nayif

Nayif Nayif
Min gulî û biskên coxrafya Kurdistanê
Li ser kêla te nijinandin
Hingî dengek hat
Dengekî kal di nava dîrokê de hat Nayif
Û got:
-Dîrok nabe warê xeydokan
Hingî min gotin tuj kirin
Hingî min navê evînê fûrand
Hingî min dilkevniya xort û dotên nûgihayî hejmartin
Û min got:
Ez diçime agir, ez dibezima agir, ez dirahêjime agir
Sê deng û awazên têr olanî
Bang û qîrêna têr hawarî
Sê caran min deng kir
Bo agir di mista destên min de rûne
Û Zerdeştê Kal di nav gotinan de tenê ne mîne
Beziyam ha beziyam

Tevna evîndariya dotan
Strana dilsoziya xortan
Ku di nava şahlewendiyeke efsûnî de tê gotin
Birîndariya demê dilorîne
Nayif Nayif
Mîrina te bû gulîstanek li ber min
Bû hêviyek Nayif
Bû çavên karxezalî
Û dîl rabû û ax û kevir û kûç rabû
Û goristan
Û evîn rabû ser piyan

VII/

Min destek kulîlk peyda kir Nayif
Kulîlkên têr bêhn û bê nav
Min çiyayên di nava şewata têr kul û keser de
Deşt û newalên bi navê kuştîyên demsalan hatine bi nav kirin
Zarokên bi beşûşîyeke têr hêvî mezin dibin dîtîn
Min komên xelkê dîtîn ku li pey tolê dibezin
Nayif Nayif
Rojên bi mirinê melûl
Zîndanên têr mişk û mar, têr xirêmokî dîtîn
Êvarên bi teqîna bedenên birîndar nas kirin
Û koçberiya ku
Tirpespî sêwî, bê derfet hiştîye
Herê herê Nayif
Bagok di nava straneke nale-nal de maye
Çiyayê Mava kovaniyê dibêje
Ava Cerihê nema deng dide
Û jinên Kêlhesanekê
Xalvedana karwanên di nava rengê maqûşî de
Ku ji Dêrûnê ber bi Bawerdê rêz dibûn nema dihorîn
Xabûra di Tewratê de ji gotinên reşbinî hatiye şîştin
-Hex û Helex û Mizîzex
Stranên li ber dîwaran na lorîn
Kevok
Hesreta min
Koçberiya dilên birîndar
Û basimbara xaka welatê min
Car din
Nayif car din di devê topan de wêran bûye

Kesî bextreşîya xiyaretê ne kiriye xeftanê mirovaniyê
Kesî wêneyê maşoqiyê bê ramûsan
Kesî navê mirina evînê
Û welatekî mîna Kurdistanê
Ji bîr ne kiriye

VIII/

Nayif Nayif

Min hesretek danî ber xwe

Û stranên Ciwan

Hêstirên Ecemê di mista xwe de veşartin

Û bêdengiya dilpenahiya Mamê Birahîm

Lorîna di nava barudê de xeniqî

Tewirandina dengekî naskirî ku di nava tîrêjên rojê de pêçayî
ber bi çem û bestikên dilan diherikin

Bi kesereke dîrokî rabe ser ligan

Bo xelatekê bidim

Bi bisk û guliyên hinekirî

Xelateke bi bîranîn û serpêhatiyan neqîş kirî

Û destanekî hemdemî

Bi tengezariyeke koçberî hunayî

Ji bo bihara demsalên winda bikevine nava gotinên min

Û helbesta min

Bigihe şevên bê fanos û findik mayî

Nayif Nayif... Mirin çiqasî giran be

Dibe hestê cîhana ku ber bi pûçbûneke risasî diçe

Û li gastîn

Û zeviyên Kurdistanê

Dibine pexşan û bêndera gulbijêrkan

Navê te Nayif

Navê hevalên te ku di nav berf û borana baruta fetsînokî de

Bi stran û hêstiran têne avdan

Bi qîr û banga hawarê

Di nava haveynê çavên zarokên ku nû ji dayika xwe re dibin

Bi pîrozbahiyeyeke salvegerên mequşî

Û şahbaziya tevgereke mezin

Navê azadiyê dilorînin

HER TIŞTÎ BI EVÎNEKÊ DEST PÊ KIR

-Ji bo Burhan Karadenîz-

I.

Min pênuşek nas kir
Û teqînek
Min gulek di nava birîneke kevnare de
Bi ser morîkên li hev komkirî
Û êşeke têr qolincî nas kir
Bêyî ji bîr kirineke dûr
Bêyî serpêhatiyeye bê nav
Mîna Nesîmî di nava çermê xwê de razayî
Mîna zarokên di nava listikê de ne tepte
Min navek nas kir
Di nava xortaniya li ser rûpelên rojnamê nivîsî
Navek
Û pênuşek
Û êşeka bi berê sor li ser movikan daxdayî
Û serûweneke mezin nas kir
Bila bête gotin
Ku min xwîna li ser berfê
Xwehdana li ser mermeran kom bûye ji bîr ne kiriye
Nûçeyên rojê
Û bûyer û pêhatiyên kirêt
Di nava reş-tariya şevê de
Hemberî zordestiya roma reş nivîsîne
Her roj bi fermaneke nû re
Her roj bi cengeke nû re
Heydêniya koçberiyê dest pê dikir
Û pênuş
Û navê li ser rûpelê rojnamê li wir bû
Gul diket
Barûd diteqiya
Birîna li ser movikên pişta min zêde dibûn

Dar bi xwîn dibû
 Hêstir û leylanên devê dost û yaran bi xwîn dibûn
 Pel diweşiyar, stêrikên asûmanan diweşiyar
 Cîhanê dengê xwe ne dikir
 Zarok digiriyan, dayik digiriyan
 Ê li sikakên Amedê xort diketin
 Kevok diketin
 Payizok diketin
 Çarîneyên bi zengilê sus-firoşên bargiran re
 Parçe parçe diketin ser pêpelûkan
 Çavkaniyên dilan bi yek carê zuwa dibûn
 Çîrok dihatin gotin
 Çîrokên bi xeftanê mêrxasiya demê pêçayî
 Ê çûk difiriyan
 Xwîn diherikî
 Tîmên taybet diavêtin ser xewnên mirovan
 Hêvî dihatin kuştin
 Pênûs dişikandin
 Bi teqînê re gul
 Bi teqînê re gotinên li ser lêvên xortekî rojnamevan parçe dibûn
 Diketin ser germa Havînî
 Ê navê di germahiya dilê min de rûniştî qîr dida
 Mirin dihat
 Bi reşbîniyeke bê rawestandî
 Xwe li welatê min dipêça

II.

Her tiştî bi evînekê dest pê kir
Awireke şikandî
Kenekî mircanî
Û gotineke di nava pêl û şelqên okyanusan de
Dilekî ku bi ava herik re dimeşiya
Nexşeyeke bê reng ku coxfarfa welatê min
Û karhezaliya çavên nûçeyên rojnamê
Û suwariyên di nava xemla rojê de rûniştî
Bi hev re dihatin
Rengekî gulê
Rengekî sosinê
Rengekî pêûsê
Di nava teqîneke mezin de xuya dikirin
Bi berbanga di nava gewrikê de pêçayî
Rojnamevan ket
Cengê berdewam kir

Bi baranê re diketin kulîlk
Li ser baskên avê, di nava nazdariyeke tengzarî de
bi ser hevokên nûçeya manşetê de dirijihan

Fanosa dil
Agir
Û xwîn
Weke baqek ronahî
Li nava sikak û kolanên Amedê geriya
Kevir bi kevir, mal bi mal
Anîşk bi anîşk, zarok bi zarok
Ramûsanên azadiyê bela kirin
Û hat
Bi gotin û stranên hemberî şevê bang kir
Helbestên evîne xwendin
Gundên sotî kirî
Xaniyên bi ser hevûdin de hêrivandî hejmartin
Gorîstanên bê nav
Birçîbûna di nava çar dîwarên malan de veşartî dîtin
Xwe li stêrikan pêça
Û hat
Li cihê ku rojnamevan ket
Rawestiya

KULÛLKA AZADIYÊ

Bêyî te nayê nivîsandin evîn
Bêyî te çav nas nakin
Dîlzarim

Çirîskên li ser avê pêl nadin
Kaniya şaristaniya mirovaniyê nabe çavkanî
Beyî te
Ahû nade hesin
Û cewherê xencerê
Dilwêranim
Bêyî te keska agir
Zarokên Çiyayê Hevêriya
Û petrola Ramanê
Demsala stuxwar
Ku di nava qolincên demên bûrî de dinale
Bizrê erênîyê nade

Pênûsa evînê di nava salnameya demsalan de şikestî
Li ser kefa mista bê haveyn
Deng û olan nade
Deftereke şewitî
Bîranîneke bê ders û qinyat
Bêyî te
Gotin di rista helbestê de rûnane

Bajar û navçeyên nîşaniya delaliyê
Cumbaşa dilên kanîzerkên bedestanan
Çavên şagirtiyên cewherê dil
Baxçê gulan bêyî te kulîlk venakin
Xewnên parçe kirî
Hêviyên winda
Rabûn
Rûniştin
Reva di nava dîlana keşkûlî de xeniqî
Û teqîna tivinga di kemîna xiyanetê de
Di nava hinav û gurçikên birçîbûna zarokan de
Hawar, bêyî te nabe

Mirina dengzêrîn
Hilêlîkên şevê
Hîva şevîniyê
Gula Berbîro
Ku di nava xizaniyeke ah-û zar de dinalin
Dilaram nabin
Û bizrê jîyanê
Axa şewitî
Ku ji ber kevnariya zilmê xelas nebûye
Çavkaniya helbesta ne tamam kirî
Hesret
Tenêbûn
Xerîbî
Û birçîbûna bi sermayê hatibe pêçan
Rojên ku di nava bêzariyê de dîl dikevin
Şîna zarokan
Zarokên li ser gorên welatekî bê nav digirîn
Berkîk
Karxezalên ji zilma nêçîrvan direvin
Gundên şewitî
Riyên bê rewingî mane
Bêyî te nabin

Şevên di nava şîneke girî de
Û ez
Bêyî te nabin

Helbestên li ser kaxezên perpitî
Gotinên li ser belgên dara berûwê
Fotografên di albûma salvegeran de ji bîr bûyî
Boyaxa çapxaneyên ku dûrî me ketine
Defter
Pirtûk
Cîhanname
Ferheng
Û nexşeyên bê tixûb
Bêyî te
Di rengê dûrketineke bê encam de dimînin

Ji min re çi dimîne
Yanî ji bo zarokatiya min
Yanî ji bo tenêbûna min ya dîrokî
Û coxrafya ne hendesekirî
Çi dimîne ji min re
Xelata mezin
Ku bi xwehdan
Ku bi êş
Ku bi maşoqiya rengîniya çavên te hatiye avdan
Ku bi xwîn
Ku bi bîrinan
Ku bi şemala rojên sotîkirî hatiye şîştin

Bêyî te çi
Bêyî evîna te, çi dimîne
Ku ez dikaribim rahêjimê
Li cihê ku ji nûjen de cîhan hatiye ava kirin
Ji min re çi dimîne delala min
Dilrevîna min
Navekî li ser mermer nivîsî
Helbesta ne tamam kirî
Û straneke nîv rê
Ahên
Dîrok
Û kulîlk

Erêêêê
Şahnaz û dîlbera min
Piştî te dilekî hejar
Û kulîlka azadiyê
Ji min re bûye xelata mezin

agir

*çemê evînê diragire bedena di nava agir de
Û min bi xwe re ber bi azadiyê dimeşîne*

AGIR

I/

Du stêrik

Du tîrêjên avjeniya dilê evîndar

Li ser kevçika turaba Moskowa

Bi ser mikewniya jiyanê de rijyan

Du dilopên hesretê

Du gotinên bi haveynê azadiyê hatine stirihandin

Di nava gulvedan û xemla pêtên agir de

Baxçeyên dilê mirovaniyê lerizandin

Agir leyist cîhan şelişî

Awaza bi kulîlkên argûnê xemilî

Di kolan û sikakên çar anîşkên cîhanê reng vedan

Mîrov behitîn

Dîrok bi xewneke hêbetî

Ji nava kesûliya zingar girtî hilçeniya

Bi çavdariyeke sundxwarî

Merxasiya dema destanên dirêj

Û dema çîrok û çîvanokên li ber tifikan

Ristikên gotinan darvedikirin

Ku hîna di teknolojiya sedsalê de

Nehatina nivîsandin

Ku hîna tenq û topên teknolojiya dawî

Balafirên awir şewat

Nikarin bersivê bidin

Bi gurzê Rastemî Zal

Bi şûrê Qeretacdîn

Bi rima merxasekî bê nav

Û evîna Ferhad re rûniştine

Du dil
Du can
Di nava keske-zeriya hevrişmî de
Diçirisîn
Erd lerizî
Asuman hejiya
Meydana Sor bi morîkên agir derizî
Çariyana bê dar û devî
Bedestana awir wêran
Moskowa
Li ser kefa mista du mêrxasên Kurd
Du şahbazan
Bi ser dilên têr şîn de diherisîn
Rûpelekî nû vedikirin
Îro
Ku hîna di dîroka dêr û mizgeftan de
Di xêşmên kesnedî de
Di dîroka bi xwîn hatiye avdan de nehatiye nivîsandin
Bi geşbîniyeke dilê çarmixkirî
Bizmarên çar parsuwî daxdayî
Bi pênuşa rimiya agirê neftê
Benzîna zelilî
Dilop bi dilop
Di nava heydêniyeke bê bersiv de nivîsîn

Mezin
Canfeda
Cengawêr
Û mêrxas

Afûra Nuhê Kal dane dest pê kirin
Gunehkariya sedsalê ku mirovaniyê kiriye bar û piştî ji xwe re
Di nava gilî û gotinên tewanbarî de fûrandin

II/

Du evîn

Du mînak

Piştî taştiya palevaniyên

Ku bi stranên palehiya dəs û qeynaxan xemgîn

Û pişt qersifî bûne

Bi çavdariyeke dîrokî

Ehmet

Û Remzî

Bi dilên liqasî daristanên sinsilî

Bi şiyarbûneke tofanî

Di nava baweriyeke bê bersiv de

Hemberî cîhana di nava pêlên bazirganî de

Ku bi ava simaqê hatiye şîştin

Hemberî tevgera têr şiltaqî

Têr xap

Têr şerm û ar

-Bîdonên benzînê bi ser hev de rijandin

Agir

Awaz

Bang

Û dil

Û evîn

Di nava agirê azadiyê de

Dîlan girtin

Stran gotin

Bi dengekî têr olan

Qîriyan

Agir geş bû

Mezin bû

Hat

Li ser pêpelûka deristana Ewropa rûnişt

Qesr û qonaxên zordestiyê hilweşandin

Kevir û kûçên kolanan

Beden û kelihên dagirkeriyê

Bi ser hevûdin de hêrivandin

III/

Du awaz
Du bang
Bi sehriya piştî rojhilat
Rojeke sayî
Li ser baskên ewrên bê xem
Di ekranên telewizyonan de xuya kirin
Morîkên agir
Di kefa wan î bi benzînê hatiye şîştin de
Bi qewlê Pîrên Çil Pîran
Stranên azadiyê xwendin
Kevnariya ferfûliya odayên têr reşbînî
Bi keskûniyeke destanî wêran kirin
Dilên şikestî
Awirên wêran kirî
Hêrs dikirin
Bi mêrxasiya di nava duwêlan de hatiye şidandin
Bi dengê bilûra têr heydênî de hatiye guvaştin
Û hilêlîka das û qeynaxên
Bi çerx û çakûçên li ser sidanan hatine çêkirin
Mij û morana xizaniyê dihilweşandin
Du hêvî
Du dirrên spî, ji bîra zerzemîn
Hesret dibarandin
Roj di kûra zerzemîna asûman de rûnişt
Kevana Heyvê
Ku bi buxza zilmê hatiye şidandin
Bi awireke pesindarî
Bi her du mêrxasan re dikeniya
Roj
Agir
Û du can
Û du dil
Û du çirîskên jiyane
Li ser kezîkûra azadiya cîhanê
Li ser porkura rizgariya mirovaniyê
Dişewitîn
Êşkere
Vekirî
Li meydana Moskowa

IV/

Du Baz

Du Başoke

Û kelagirî

Û dayika Kurdistan

Di nava xeftanê dilojarêya dîrokî de

Di nava hêrikên barudxwarî de

Û meslên bi gaza sarîn sotî kirî

Di herhilî

Geliyê Zîla

Çiyayê Dêlegurê

Çiyayê Mêdiya

Û hawara Seyrê

Xwîna di Keliha Comaniyê de

Bi xencera xiyanetê hatî kuştin

Bê xwedî mayî

Xwîn diherikî, mirov dişewitîn

Berê topên bi ser Şirnexê de dibariyan

Kevir û goştê mirovan di nava hev de diperçiqîn

Şiltaqî

Û mizgîniya di nava xemla neçariyê de pêçayî

Hestiyên rizî

Newal û geliyên bê semyan

Deşt û qelaçên birîndar î bê derman

Û lingên dibin felaqê de bi pelqîzan

Rabûne şipê

Banê Bêrma Midyadê

Wargehê sêdarên şenqê

Û 21 cangoriyên Bagokê

Bagera Tinatê

Û top û mozoliyên bi şûtik girêdayî

Ji Beriha Segvên ku roja gonê bû şikêra mêran

Heya bigihe Elegêza sergom kirî

Navê bêzariyê li ser eniya dîrokê dinivîsîn

Hesreta Şêx Seîd
Degeliya Zîlan
Beşûşiya li ser lêvên Nayif
Û semaxa dilê dayikan
Û hemberî mirinê
Qîrêna Sêdar û Siyamend
Lokman û Fîraz
Bahoz û Guhderz
Bi her du pozberanan re
Bi her du cengawerên sedsalê re
Dikeliya
Afûra Nuh
Kafûra Nemrûd
Zordestiya Roma Reş
Bi ser dergûşa jiyane de diweliya
Dergûş dişewitî
Zarok dişewitî
Ax
Kevir
Av û dilê mirovan dişewitî
Hesret
Reşka çavan û hesreta bê rawestandîna dişewitî

Wê rojê du xortên Kurd
Li meydana Moskowa
Rûpelekî din ku bi xêzikên agirê dohnê mirovan hatiye nivîsandin
Vekirin

V/

Agir mezin dibû
Moskowa biçûk dibû
Awaza Ehmet mezin dibû
Cîhan lal dibû
Banga Remzî fereh dibû
Mirovanî jar dibû

Biskên temborîkê dikizirîn
Bela dibûn gotinên siloganî
Bang û strana azadiyê
Bi morîkên agir darvekirî
Li Meydana Sor diketin
Difûriya avzêmka dilê dost û yaran
Kelih û bircikên dagirkeriyê
Di nava kevirên hestemî de diweliyan
Du berx
Du evîn
Û bejnûbala bûkaniyê
Ku bi stranên xêlî û berbûlî
Dixemilî
Di nava delaliya azadiyê de
Li ser kefa mista xîretê rûdinişt
Pîroziya asûmanî dirijjya
Bawerî di nava mikewniyê de
Mîna awazên ayînî mezin dibûn
Du xencer
Du dirrên cewherî
Di nava rengên argûnî de
Sor î sosinî
Ber bi gerdûnê dirêj dibûn
Du gul
Du Bilbil
Du Şalûl
Du helbest
Di nava baxçeyê dilan de vedibûn

VI/

Ne mirin bû ew

Du al bûn ew

Niyazeke zincîrkirî û du kevok bûn ew

Ji bo azadî û aşîtiyê difiriyan ew

Agir

Azadî

Û Remzî

Û Ehmed

Û gorîbûna pîroz

Li ser salnameyên paşerojan rûniştin

Zarok

Kolanên bajaran

Çaryanên rêwingîtiyê

Navê wan li ser nêçîrvaniya hemdemî diqîrin

Û bi me re, di neynika helbestên me de

Dimeşin

Bi tovê jiyane re, di nava simbilên dextê de têhnîk didin

Di pişkivin

Ajda di nava rewya erdê de

Sîsika peqandî

Katika nû derketî

Dendika di nava haveynê jînê de

Dijîn

Bagera di nava ahenpûşî de pêçayî

Perda çavan

Û şîrê dayika xwedî dergûş in ew

Ew bi tîlên tembûrê re

Di nava cotbariya salê de

Di nava miştaxa rezên bargir de

Bi hildêrana benderên gastînkên de

Bi listikên zarokan

Navên nû

Mîna ronahiya berbangê û germika dijwar î nîvro

Dengê naqosê

Banga melê

Û ayîna her sê danê rojê ne ew

Weke saloxdanekê bi me re ne ew
Li ser dîlana serketinê
Sergovenda iyaneke nû dileyizin ew
Û kevirê kelih û bircikên rojên nû
Ku bi tayên hevrişîm hatiye girêdan
Şax û qoratên xwe berdana malzaroka erdê
Bi dûwêla şimakirî hadine şidandin
Kûr
Û dûr vedana

Ew
Bûne agir û ketin
Di cihê wan de jiyaneke nû
Bîranîneke nû û xewrevêneke dijwar
Û kulîlkên hêviyê vekirin
Dayik
Zarok
Û al
Û rengên rojê
Basimbara destpêka biharê
Û gulbijêrkên dilrevînî bûne yek beden
Di nava bêxemîniya cîhanê de
Di nava hestên hişkbadayî yên mirovaniyê de
Pal dan û rûniştin

Ji holê rabûn kincên şînê
Reşbiniya dayikan
Û kalemêrên awir şikestî
Dotên kezîkûr
Rabûne ser xwe

Ji holê rabûn stranên dilojarê
 Û dilşewêtiya zarokên li meydana
 -Romî nikarin arjîna evînê bi perçiqînin
 Êşkence
 Darvekirina egoîstî
 Şewata cixara li ser singên nûgihayî
 Elektrîka di nava goştê mirovan de
 Bi tîrêjên brûskî hêlîna xwe çêdike
 Ji holê rabûn-
 Roj û şev
 Û deristanên kînê
 Dewsa xiyaneî
 Bi tifeke têr şermezarî sotî kirin
 Gêrik û mîro
 Pêşî û mirmîrk
 Mar û dûpişkên ku navê bêbextiyê li aniya wan nivîsiye
 Û qolincên têr tevzînokî
 Û ta û bayên bi felaqê
 Ku di nava trîşkên laşê me de melisine
 Ji holê revîyan
 Dezgehên reşbiniyê
 Sazûmanên wêraniyê li petaxê ketin
 Li petaxê ket her tişt
 Kevnariya dilan
 Zordestiya bê hember
 Ji holê rabû
 Kevan û mesilên çiyarêzên Kurdistanê
 Darmêweyên li ber Ava Mezin
 Û spîndarên Newala Stewrê
 Bê çawa bi tewirandina ciwanikan
 Bi horhora evîna xortanî
 Pesindariya xwe didin
 Bi çalekiya her du timalê xortan
 Mîna pêl û şelqên Okyanusan
 Ku li qeraxên dilê bejahiyê dixin
 Di nava geşbîniyê têr hêvî de
 Pesindariya xwe didin
 Û navê rûmeta di nava xeftanê pêsîr miqewr de pêçayî diqîrin
 Dayikên dinava şînê de pelixîne
 Axa ji mirinê têr nebûye
 Barûda ji teqînê ciz nebûye
 Di nava şermezariyê mezin de stuxwar mane

Evînê rekiha dîlzariyê şikand

Mirin

Û tirs

Di nava êrîşên canbêzarî de xeniqîn

Êdî xewnên di nava xeftanê tirsê de reviyân

Kulîlkên hêviyê

Li ser axa xetbizêr

Li ser gotinên helbestvanên hemdemî

Di nava ava zelifî de dikenîn

Kenê zarokan

Lîle-lîla jinan

Bi navê cengawerên welatên min de deng dikin

Di nava dexla salê û benderên demsalê de

Û darmewêyên demê

Bi gulbijêrkan re

Bi kulîlkên yek tayî re

Bi tûtakên serê çiyân re

Û xum-xuma ava bi dengê bilûrê re hêdî hêdî

Û dengê neyzenê di ber strana Zembilfiroş re dinewirîne

Weke mistek hêviya evînê difûrîne

Bi akorda bayê xerbî re

Stranên rizgariyê dilorînîn

DÎLANA AZADIYÊ

Dem hat...
Xeyalên di nava evîna dil de pêçayî...
Ji nava şevê derketin... Li ciwanîka rojê suwar...
Hatîn... Pêşî roj nas kirin û agir...
Bi gotina yekem car ji devê mirov derket...
Gotin û agir!..
Û helbest... Her sê, di nava xemla rojê de!..
Her sê: Di nava ronahiya dilan de...
Her sê: Di nava geşiya çavan de...
Ji nava daristanê derdikevin... Ber bi okyanusan diçin...
Liqasî çem û bestikên kevin dibin... Liqasî daristanên kevin...
Û evîna kevin... Û liqasî destanên kevin dibin...
Xwîn agir geş dîke... Hêstir agir xurt dîke...
Û gotin evînê mezin dîke...
Staraneke şewat...
Baweriyeke mezin...
Ku Prometo dilê xwe avête nava agir...
Agir di mista xwe de veşart...
Di nava pesindariyeke têr mirovanî de agir revand... Hat!..
Rahişte dilê xwe û meşiya...
Bi dengê bê bersiv bang kir... Staraneke nîvrê bersiv da...
Awaza di nava helbestê de hatiye veşartin... Melisî...
Di nava rimî û pêtên agir de guliyên keziyên şevê... Ronahiya çavên
stêrîkan liqasî mirina kevin bûn...

Şewitîn...
Agir leyist...
Serenadên evîna jiyane lorandin...
Gotin şewitîn...

Birîn kevin bû...
 Mirin kevin bû...
 Lê ji bîr nebû...
 Mirina zarokan... Kuştina kalan... Hêstirên dizî...
 Û kuştinên ku hejmara wan ne diyar... Ji bîr nebûn...
 Agir dileyist...
 Beden û evîn di nav de...
 Cotikê çavan... Germahiya kefa mista xortaniyê di nav de...
 Agir li ser malzaroka jiyane dileyist... Bircikên dilê helbestê di nav de...
 Kelihên dilê romanê hêrivt... Qesr û qonaxên dilê çirokê wêran bûn...
 Demsala birîndar... Di nava kevirên şewitî de pelixî...
 Di nava mistek barud de kerixî... Pûnijî...
 Û nefta dilê mirovaniyê reş dibû... Û kuştin... Qirkirina roja gonê...
 Li Eleqemşê ji bîr nebû...
 Agri dileyist... Gotin dibûne silogan...
 Helbest dibûne slogan... Ekranên telewizyonan...
 Rûpelên rojnameyan dibûne slogan...
 Ajansan bîstûçar saetan slogan diweşandin...
 Û evîn dişewitî... Hesret dişewitî... Û dil di nava daristanê de...
 Û gotin di nava okyanusê de... Ji bîr nebû...
 Şêstûsê nav... Şêstûsê destan... Şêstûsê helbest... Şêstûsê roman...
 Şêstûsê dîrok... Şêstûsê stêrik... Şêstûsê nav...
 Bi bûka rengzêrîna azdiyê re zewicîn...
 Xemleke bûkaniyê...
 Argûnî...
 Şêstûsê reng... Û şêstûsê agir... Welatê min ronî dikirin...
 Agir leyist... Harran parçe bû... Stranêke dezgîranî derkete holê...
 Agir leyist... Mezopotamya rabû ser lingan...
 Helbesteke evînî derkete meydanê...
 Û roj... Di kefa mista xwedanê şev û rojê de...
 Li hespekî deryayî suwar... Di nava xeftanekî mizgîniyê de hat...
 Agir leyist... Cewherê jiyane ji nava xwîna min fûriya...
 Dirrê evînê

ji nava xwîna min çirisand... Û av!..

Û kanîreşka çavan

Agir leyist...

Qewlên ayînxanên behîştê welatê min dîlan girtin...

Bi siloganên şêstûsê cengaweran re kevoka spî xemilandin...

Soz û peymanê roja gonê... Li ser qefta xencerê mîna neqşeke
sozdariyê hate kolan...

Agir leyist... .

Pêxemberên sed sala bîstan govend girtin...

Peyam û peşanên demê teva...

Çiyarêzên Kurdistanê... Dilên birîndar...

Û alfabeya wînda... Û dîroka di nava kevnariya zordestiyê de talan kirî...

Mîna okyanusê fûriyan...

Mîna daristanan rabûne şîpê...

Ezman hejiya...

Stêrik yek bi yek hatin...

Li ber agirê azadiyê ku bi bedena xortên welatê min...

Ku bi hêstirên dayikên welatê min...

Ku bi siloganên şêstûsê cengaweran

Gur û geş bûye...

Di nava sozdariyekê de dîlana azadiyê girtin...

Ber bi rojê meşîyan...

SOZA ME HEBÛ

Li asoyê bê nexşe resmê te hebû
Kulîlka di rengê çavan de
Û soza min dayî
Roja gonê
Ku riyêke dirêj û têr kelem derkete pêşberî me
Deryayên reng winda
Pêl û şelqên hemberî çiyar
Bi qurtek awa paqij
Û mistek axa hîna toza mirinê pê werne kirine
Min dest da evîneke nû
Ji bo bîranîna demjiyanên bi tenê
Û biharên bi kuştina zarokan melûl
Zarokên bi ala welatê min pêçayî
Toz û dumana riya dûr
Kemîn
Xefkên dijwar
Tirs
Û mirina ji hêbetan direve
Uy hawar pora di nava kizîrê de
Hey gidî dilê di nava hêrsê de
Germ û gûr bûye
Salên bi tenê çiqasî zor in
Demsalên nezan çiqasî giran in
Û evîna dîlzar
Dema bi qundaxa şazîberno
Leylana hemdemî lorand
Hêvî, bi sundeke mezin
Ji bo bihareke nû
Ji çiyar û deşt û newalan barî

Kezî kurê dayê
Kesî ji zimanê min fam nekir
Min aşîtî bang kir
Min bêzarî lorand
Min xizanî strand
Her û her kulîlkên bê nav
Roj di nava agir de pelixî
Û dil
Û mêjî
Û nan
Bi delala dilê min re hat
Bi gotineke nû
Bi awireke nû
Pêl dilê xemgîniyê kir

Weled lawo
Nifir
Û hêviyên bi banê banî re
Yezdan
Qewl
Ayet-el Kursî
Bêhnefişka zarokan
Giriyên jinebiyan
Hêvî nedan
Di destên me de agir hebû
Rê dur
Bar giran
Û ez
Û evîna min bi tenê
Sedsal gunehkar û demsal wêran
Agir hebû
Di kefa mista di nava rengê xemrî de pêçayî
Agirê ji kevnariya dîrokê
Tenê ez
Û evînek
Û soza me dabû

Çawa min ji demsalên zêrîn gotin û galgal vekir
Xirîqa mirinê dengê xwe kir
Çûk û leylanên dilê min firiyên
Winda bûn çûn

Stranên Jiyanê

*ez, di nava stranekê de te dibînim
li her qonaxêke mikewniya dîrokî
ku bi helbestan hatiye ava kirin*

BÛKA WELATÊ MIN

Paş de vegeriyan

-Piştî banga dawî ku li dibistana mezin
geliyê dilên bê nav hate kirin

Roja karwanê mezin kete rê

Wê rojê

Ku barê giran danîne ser milên xwe û meşiyana .

Asoyên xewnên giran hate guhertin

Paş de vegeriyan

Bi şûr par vekirin nanê xwe

Fişek bi hejmar

-Ev para te ye Hevala Zelal

-Ev jî libek xwê

-Hinek mewjên salê ne

-Bila ev jî di tûrikê te de bin hevalê Zinar

Li wir

Kefenê dijmin dirûtin

Derzîndanka demsala bîstan

Di nava nivîstokên bi xwînê hatine nivîsandin veşartin

Ji bo bersiva dîrokê bidin

Û ji bo pêşwaziya sedsala bîstûyekê amade bin

Dilopek xwîna xwe di nava kîsikê dil de bi cih kirin

Berî ku bi rê bikevin

Bi rêzê dest dane hev û kenîyan

Zelal ji berîka xwe dirrek derxist

Bi awireke di nava ramûsanana de pêçayî nêrî û got

-Hevalê Zinar ev jî para te ye

Bexçika dayika Zinar hate bîra wî

Ku digot: Ev xelata bûka min e

Zinar bi leşêrîneke beşûş got

-Tu bûka welatê min î

Ew para te ye

Parçek hîv
Parçek darîstan
Û parçek ji çemê jiyânê
Li ser hinarkên rûdêna her duwan rûnişt
Dîlokê dest pê kir û meşyan

Axa perçiqî
Erda parvekirî qîriya
Xanî, sikak û zarokên dibistanan
Malên bê xwedî, kolanên vala
Û roja ku toza sift bêhna mirinê jê dihat rijiya
Hingî sunda emanê xwarin
Da hemberî celladê demê
Û nijadperestiyê
Û mirinê şer bikin

Destanên dîrokî şiyar bûn
Çend sedsal in ku xwîn ranewestiya bû
Xwîna ku di tu cengan de ne rijiyaye
Giriyê ku tu dayikan ne kiriyê
Dilê tu evîndaran ku wiha ne şikestiyê dest pê kir
Atmofereke lewitî
Ax û aveke pingihayî
Ku ji ahenpûşiya kevnare derbikeve
Ji nava xeşîm û nawîskên dîrokê herikî

Kurdistana ku bi Zelal û Zinar re sozdar
Di nava tozeke zer de xemilî
Bêhneke dijwar, duxaneke sift ji asûmanan bariya
Bagok di nava tengezariyekê de xeniqî
Erda ku bi vegera cengawerên sundxwarî re
Li hev hatî
Kevir û dar û devî
Tîr û xencer û gotin
Û evîna dilên cangorî
Ku di nava efsûniyeke rizgarîxwaz de bûne yek
Giriya

Car din karwan ranewestiya
Barê evînê
Û dilê mirovan
Ku di nava ewrên spî de pêçayî
Bi stêrik
Û kilê çavan neqîşandî
Gihandin qonaxa sozdariyê
Bi meş stran digotin
Bi ken û yarî dîlan digirtin
Qonaxek dihilanîn
Yek didanîn
Av di mista xwe de meyandin û vegeriyan
Piştî 21 caran 21 qîr dan
Rima Kawaye Hesinker
Di serdilkê xiyaretê de rûnandin
Asoyê şivanan vebûn
Roj hilat

Hingî dîrokzanê demê kaba xwe berda erdê
21 qîr
21 yek can
Yek bi yek
Li ser kevirên Kurdistanê
Mîna bûka demsala bîstûyekê nivîsîn

BI MIN RE

Berî ku navê te bêjim
Pelek ewr weşiya
Û dilê te bi çûkan re lorand

Evîna te bi min re

Berî ku bangê te bikim
Strana li ser lêvan parçe bû
Ku bi ramûsanên xortaniyê hatine hunandin

Awaza te bi min re

Digot evîn girêdana mezin e
Bêyî giriyê di nava şînê de melûl
Mîna şeveke bi tenê û birîndar

Agirê te bi min re

Dojeheke her kesî heye
Gotineke her kesî
Û hasreteke di nava hêviyê de pêçayî

Navê te bi min re

XWÎNA LI BER DÎWAR

Li gundekî
Di quntara çiyarêzên di ser Ava Mezin re
Ku bi tengezariya baranê û hêstirên çavan ava bûye
Sala gonê, hîna Berfa Sor neketî
Xela û cela dawî çênebûyî
Bizrê kulîlkên biharî nû nû dipijkivîn
Rengê di nava hilma rojê de
Di nava sergêjekê de mezin dibûn

Destpêka biharî li wî gundê ku çîroka wî
Xwehdana mirovên wê nehatiye nivîsandin
Serpêhatiyên mirovan nayê zanîn
Dîroka dilojarê li ser neynika eniya zilmê hatiye nivîsandin
Li ber dîwarê hewşa mizgeftê
Ku melayê gund û naqosa berbangê bi hev re
Bi dengê bilûra şivanan re dilorînin

Sê keç
Çar xort
Û kalê malê
Ku li ser sifra dilê xwe nan dabû wan
Gulebaran kirin

Xwîn diber dîwarê mizgeftê re diherikî
Li taqê dêra zemanî rawestiya
Dibin potînê eskerên Roma Reş
Û mirovên ku navê wan çavîk in diperçiqî
Yarî dikirin terezbavan
Bêhna xwînê li pozê wan dida
Kêfxweş dibûn
Bi dengê sebinyatan re mikewniya jiyane pûç dibû

Ewrekî reş, di nava xumamê de pêçayî girte ser gund
Hêstir, êş, kûnêra qolincî û şîn ji holê reviya bû
Zarokên gund derketin
Bi xurrêna mozolîyan re derî şikandin û revîyan
Tîrsê çavên xwe pelû dikirin
Û kîn mezin dibû
Navbera axê û aştiyê fereh dibû
Pirtûkên nehatî nivîsandin teva di nava pêtên agir de dişewitîn
Û navbera xwînê û erdê fereh dibû

Mirin dihat
Goristan mezin dibûn
Li gundê quntara çiyarêzên mil dayî hev
Bayek dilivîya,
Bayekî hînik ku xulfên çilo dilerizandin
Û gundî bi werîsê rîsê salê girêdan
Di nava awirên şikestî de birin
Hîna dewsa wan xuya dike
Ew nînin
Jin ne girîn
Keçan titina bavê xwe di nava heft paçikan de pêçan
Di paşila xwe de hilandin û evîne dest pê kir
Dayikan hêstir ji bîr kirin
Şîn nema
Kîn mezin bû
Pelên ewran titina bi germahiya sîngûberê dotan germik bûyî
pêçan

Ji nişkê de dengê qîriya
Di nava refê ewran de demsalên salê hejmartin
Lîstik rawestiyên, yarî ji meydanê reviyên
Dengê zarokên ku hêstir di ser dilên xwe de diqraftin
Ava kîne vedixwarin
Xwîna di bin potînan de diperçiqî dîtin
Evîna nû kat da
Kulîlkan vekir
Rengên rojê di nava xeftanê dengê keçan de
Bi ser dilê jiyane de dirijiyên
Al ber bi ba dibû
Li serê zinarê raserî gund
Sê dengan bang kirin
Gotin:

*-Emê dîroka jiyane biguherin
Emê çarenûsiya bêmiraziyê biguherin
Emê dilê mirovan bi evîne hixemilînin*

SEDSALA TEWANBAR

Pêşî gotin lewîfî
Rojê deng nekir
Piştire dil
Şev melisî

Lehiya bê damistonka zarokan
Hat û weliya
Rumet
Ked û xwehdan
Tengezarî
Darmêweyên baxçê dilan miştin
Xîreta bi ayîn û peyama hatiye avdan
Li ber xwe birin

Xwîn kete mista mirovan
Di gotinê de ma dilwêranî
Kuştin
Û dilopên neftê
Av û lehiya piştî barana tofanî
Şirrikên şikestî cokên wînda zêde bûn
Horhorên serhildanên ne serketî
Bi tenê man
Û dîrok dibin şikêran de riziya
Hey waweylê
Di nava barûdê de kizirî goştê mirovan
Parçe parçe
Daristanên sofî kirî
Ku hîna sunda mirovan Keliha Bagokê ye
Sêdarên Keliha Amedê ye
Gotinên pozberanê Agirî
Û Dêrsimê ye

Sedsala bîstan
Ku navê wêranî û mirinê li xwe kiriye

Navê koçberiyê
Qirkirina Eleqemşê
Û hilêlikên têr qolinca tevzînokî
Xwîn
Qirêj
Gemar
Û cefta dilê kizirî li xwe kiriye

Dilên bizdonek
Evînen revok
Di nava bablîsokên tengezar de
Tevlî hev bûne
Roj lewîf
Şev gemarî
Mirov şelişî
Stêrikên bi keda mirovan şîştî
Tîrêjên bi şadûmaniya zarokan geş
Kor û kerrende mane

Nikarim navekî li vê sedsalê bikim
Dilekî di nava şevê de xencer kirî
Mirineke ku hîna dema wê nehatiye
Xelata ku mirovaniyê ne xwestibû
Sedsala bîstan, sedsaleke tewanbar e

GULÎSOR

Çiyayê dilê keçika gulîsor
Ku navê xwe li ser eniya dîrokê
Bi xemla rojê nivîsiya
Ew
Û çiyayê bi tenê
Kevirê şikestî
Û strana hêviyê li kêleka hev rûniştî
Bi dengê revok re dîlan girtibûn

Gulîsora navê wê li ser zimanê min
Bi bizmarên ahenî kolayî
Sînemxana Dêrsimî ku Bagok nû nas dikir
Û tofana dîrokê li ser rûpelê daran didît
Distirand

Gotin di geliyên kûr de
Karwan di deştên fereh de diristin
Û teyrê elo
Û başokeyên dilê evîndar li stana şînxalî
tewl didane xwe

Gulîsora dest hinekirî
Di nava bêdengiyêke mîna darîstanên mezin
Bi Şalûl û Bilbilê baxçeyê evînê re
Zelal û Cîhana ku bi movikê teliyên ziravik
Bi serê lêvên derizî
Û hilmeke germ ku ji kûraya dilan diweliya
Navê bihara paşerojan dilorandin

Ava Çemê Bûnisra
Li kêla ber serê Qeretacdîn dida
Xwîn diherikî
Bi ser guliyên Dara Bizmara diket
Ku hêvî
Û şikestîkên dilan bi hev re
Dîqîriyan

ŞEV Û ROJ

Roja gonê
Ku Gulîsora bê nav
Di nava pêlên xwîne de
Ket û ranebû

Şev digiriya
Roj dipûniyî
Jiyan stuxwar
Dil wêran

Agir dibariya ji kefa mista generalan
Hingî dara berûwê tenê ma
Li gastîna hemberî çariyana Çankaya
Kevoka spî birîndar dibû
Sê pelên ewrê ji hev de ketî
Di derya asûmanê Weşingtin de dişewitîn

Hingî berûwên binê darê
Li ser axa dibin pelê zer de
Temirî
Tenê diman

Roja gonê
Kû Gulîsora min ket
Û ranebû

ÇEND SAL IN

Çend sal in ku ez
Ku ez û evîna xwe
Ewrê jenkirî
Di şînxaliya asûmanê welatê bê cîhanname
Bi hejariya zarokên ji lîstika şevê
Ji beza nava sikakên gundan
Dûrketî, bi tenê ne
Mansûrê jempêj
Pembûwê hîna beytik venekirî
Û çiyayên têr hêrik
Di nava payizeke dûr û dirêj de
Li ber serpêhatiyên bê dunde
Û rêbûwariya winda
Bi xemgîniyeke mîrate gengeşiyê dikin
Çend sedsal in
Ku ez bi dilekî sê rojên tewandî melûl
Bi zimanekî têr hejarî
Ber bi hêstirên dayikan
Û morîkên kelpitî dibezim
Şermezarî
Gunehkarî
Bûne haveynê sedsala bîstan
Mirûsekî bêqudoş
Û ez
Bûne destûbirak
Xiyanetê her û her davik û kemînên xwe vedane
Çend sal in
Ku tovê bexreşiyê hatiye reşandin
Ku di nava çar dewletan de
Nexşeyên têr zaboq
Baxçeyên betonî
Li ser sînga min hatine ava kirin
Evîna min dipelixîne
Û hîna
Baxçeyê dilan
Ramûsana li ser lêvan
Ji min dûr in

NIJDEVANÊN WELATÊ MIN

Nijdevanên welatê min
Bi sehriya sibehî re hatin
Rextên çep-rast
Qarîş û pelesqeyên fereh
Ku bi xwehdana ked û mêrxasiyê reng guhertibûn
Pêçayî
Û bar kirî
Roj û rengên civakî
Axa Mezopotamya
Destegula gotinên parçe kirî
Baqê stranên nîvrê
Û hêstirên berhev kirî
Di xurcezînên gulî bi morîk de barkirî bûn

Nijdevanê welatê min
Dîrok û alfabeya winda
Û lîsteyeke dirêj ya gelan
Di destên wan de
Gul û sosin û beybûn dihejandin û dihatin
Coşa her kêlîka şerê azadiyê
Dilopên barana li ser tozika axê
Ku dibe xurîniya pêşî
Di nava xemleke dilovanî de
Dane dest min

Suwariyên hespên rawan
Ku serê rima wan bi alên sor girêdayî
Di nava demên rengîn de winda
Rêz û ref girtibûn
Marş digotin
Ku tenê evîne dilorîne
Ku tenê rizgariyê dilorîne
Digotin ha digotin

XEMLA AZADIYÊ

Çardeh sal in
Xort û keçên welatê min xemla azadiyê diguherin
Zarok
Û dîroka di dergûşa ne hejandî de razayî
Bê dunde
Belqîfî mayî
Jîndar dikin
Çardeh sal in ku hîna
Şopa winda
Xencera xiyaretê
Awira şikestî
Diljeniya têr qolincî
Û girîzoka bê derman
Piştî hewqas banga hawarê serrast nebûye
Ax qelişt
Lat û kevir deristin
Dilê kurmî hate daxdan
Navê kirêt ku hêrsa dîrokê dişikîne derxistin meydanê
Çardeh sal in
Bi hezaran ciwanik
Cengawerên canfeda
Bi hezaran şikêrên mêran
Cangorî
Bi destanên efsaneyî mezin bûn
Û bi hezaran stêrik
Û navên zarokan hatin guhertin
Kevokên spî
Desmal û jarên serê jinebiyan
Reng guhertin
Sal dirêj bûn
Kuştî dirêj bûn
Agir û barud dirêj bûn

Çardeh sal
 Û çardeh demsalên têr reşbînê
 Bi ser hev da pelixîn
 Hey gidî
 Gemara xiyaretê hê jî nehatiye paqij kirin
 Pirtûk hatin nivîsandin
 Serpêhatiyên gerilla zêde bûn
 Bi navê cangoriyan dîlok û leylan hatin gotin
 Helbest û stran zêde bûn
 Efsane û çîrokên civatan xemilîn
 Kalên heftê salî
 Zarokên heft salî
 Ji bo azadiyê pate dan
 Her du teliyên serketinê ji hev vekirin
 Nexşevanên demsalê
 Hatin li ser mermerê reşbelek yek bi yek nav nivîsin
 Fotografên berbûlî û xêliyê bê gazin
 Navên ji Kura Bûkê xelas bûyî
 Dîlên di grêva birçîbûnê de mirin
 Diljeniya devê girtûgehan û reva nijdevanan
 Yek bi yek nivîsin
 Di sikak û kolanan de meşa gel
 Kelih û bircikên mêşmirî
 Pênûsên tirsonek
 Û reşbînî
 Ji holê rakirin
 Çardeh sal in
 Ku xort û dotên welatê min
 Di ber sînga çiyayên welatê min de radizin
 Çardeh sal in
 Asoyê welatê min di nava rengvedanên cuda de dilerize
 Reng û roj
 Heyv û stêrik
 Ronbîniya bi ava coşê hatiye şîştin
 Û dilên bi ava zemre
 Û qewlên Laleşa pîroz hatiye avdan
 Di nava awirên wan de xuya dike
 Di destekî de qundaxa tivingê
 Di destê din de baqê gulan
 Û hêviyên mezin
 Asoyê di nava xemla rojê de rûniştî
 Û tacê bûkaniya azadiyê
 Li ser textê sedsala bîstûyekê danîne

EVÎNA MIN

Evîna min

Ewrê barkirî ku di ser welatê bê nav re
weke pelekî le ser baskê bayê xerbî
rûniştî

Û di nava tofana ava liherik de
Bê haveyn difûre
Bi kewneke tersbajarî destên xwe dihejîne

Ava çemê bê bor
Li qeraxên dilê min dikeve
Kef û kinca têt şewat hûrik hûrik
Dibine şelq û pêlên evîna min,
Bi ser nexşeya hîna rengê wê nehatiye danîn
Bajarê li ber qeraxê çemê bê bor de dirijihe

Çar keziyên ne hunayî
Li ser berga salnamê weke fotografekî reş û spî
Û demsaleke ku bi ser zarokên xwe de
Bi ser sêwiyên sedsala bîstan de digirî
Di nava helbesta min de rabûye şipê
Strana demsalê ku navê evîna min dilorand dibêje

Grî
Û dilojarêya bi ser xwînê de
Bi gotina kezîkurê dest pê dike bûye evîna min

Hêstirên di nava rengê şînê de dikelin
Bi morîkên di nava çolîstanan de winda
Çend kelihên dilwêranî ava kirine
Çend evînên şikestî
Ku ez li deristanên wan razayî me
Û kermêş di ser serê min re dirêsin

Hêvî

Û banga ku min serê xwe daniye ser kaba wê
Hemberî min bûye paceyeke dibistanê

Weke xewneke xayin her tişt hemberî min e
Her tişt hemberî evîna min xencerek e
Bi rastî hîna ez fêrî navê evîna xwe ne bû me
Bi rastî fêr bûn qedexe bû ji bo min
Lê her qedexe çavkaniyeke nû
Destpêka raperîneke xwe nas kirinê bû

Bi straneke ku her gotina wê olan bide
Û dilçoşiya zarokên dibin barana nîsanê de
Ku bi hesreta sedsalî qîran didin
Di nava şevên bê xwedî û ji bîr kirî de
Ku min serê xwe danîba ser kaba yarê
Û dergûşa jiyane hejandiba

Evîna min

Bi sunda di nava helbestê de ku ramûsanana dide
Bi her gotina ku weke mohra dîrokî dikene
Karûbara xwe bike vaye ez hatim

NAVÊ HELBESTA MIN

Evîneke çarmix kirî
Li ser gotinên dibin sintaqê de
Ev navê coxfayya min e

Û dilekî şikestî
Di nava çakûç û sidan de
Ev navê kulîlkên min e

Zimanekî bi ser kevnariya jiyane de
Mismît bûye û sûravka ne şîştî
Ev navê zarokên welatê min e

Bêrivana di rîyeke wînda de
Bi awira şikestî digeriya
Ev navê keçikên gundê min e

Û rûmeta li ser pelê ewran
Kerixî, di nava mirina bê bersiv de
Ev navê axa welatê min e

Teqîna tivinga roja gonê
Bi xurrêna kewê berbangê re
Ev navê serhildana min e

Û 15 Tebaxê
Bi hasreta ramûsana azadiyê
Ev navê dîroka helbesta min e

Xwîna di cîrnikan de pingihayî
Bi kenekî germ dihilweşiya
Ev navê goristanên min e

Qolinca têr tevzînokî
Di berbetanê malzaroka jiyane de
Ev navê bûna min e

EVÎNA MIN

I/

Evîn û ez
Di nava tenêbûna reşê de
Hinekî pelixî
Hiş û sewdan
Dibin sintaqê de
Hewnê min bêgane
Perîşan
Sê gav
Sê stêrik
Sê çirîskên ronahiyê
Ku di nava brûskên awira min de
Hêviyekê didin
Û bi hev re sê gotin
Hemberî tenêbûna di nava reşê de pelixî
Serenadan dibêjin
Tariyeke li ser cawê tuwalê ne hînkirî
Çend xêzikên bi rimiya agir parçe bûyî
Bi rengê dilcoşî
Şîn
Û Kesk
Û Sor xemilî
Mîna melodiyêke şikestî
Bilûra deristî
Dahola bê şivik
Û dîlokên li ser lêvan pişkivî
Nûjen
Ronbîniyê bi ava hesretê dişon
Ji kambaxa reşê ava jiyane
Fîrşikê jiyane didoşin

Hemberî xeşîmên hêrivî
Hemberî dîroka nezanînê
Hemberî kembera bexîliyê
Kelihên di nava agir de pêçayî ava dikin
Kelihên bê dergih
Amûrên bê akord
Stranên bê nota
Di nava mucîzeyên duwazdeh şagirtiyan de
Bilûra Pîrê Mirazan
Û sehwa giran ya goristana Xalbûbê
Ku hîna têhnika agirê Zerdeştê Kal
Mîna nafûra Nuh difûre
Rûmet
Û dexîlî
Di nava bexîliyê de hatine pêçan

Evîna min bi hêviyekê ve girêdayî
Bi tenê
Bi sozdariya refê cengawerên welatê min re
Û dilsoziya sunda roja gonê
Li gastîneke dijwar
Çadira xwe vedabû

II/

Ez û evîna xwe
Bi bûyerên têr hesret
Bi pêhatiyên têr kul û keser bizdihayî
Di xewneke giran û bê bersiv de ne
Sikak û kolanên singo kirî
Tixub û benderên sotî kirî
Û dilên dibin piyan de perçiqî
Xortaniya min
Ku hîna evîna reben dilorîne
Dibin barana beran de parçe kirî
Çerxa felekê
Rêçika berxwedanê
Û şûrê zordestiyê
Ketine pêşîra hev
Ez û evîna xwe
Li ser baskê bayê hêviyê
Bi gul û sosinên azadiyê
Weke sergûzeşteke mezin
Navê Kurdistanê diqîrin

Biskê hinekirî
Guliyên bi xwehdana mista yarê hunayî
Li ser hinarkên rûwê min bûn

III/

Şer

Evîn

Û ez

Û xortaniya şikestî bi hev re

Ji bo strana dîrokê nîvrê ne mîne

Û xemla aşîtiyê wêran nebe

Dilê pûç

Reşka çavên zingar girtî

Dikujin

Têkoşîn ne tenê aşîtiyê, ne tenê melûliya bêdengî

Jiyaneke têr degelî û azad

Baweriyeke mezin

Û bê tirs dide welatê min

Agir

Sidanê hîna çakûç li ser rûnenişî

Li ser dilê nemaza reşariyê rûdine

Kuştin

Hîna li ser sifra mirovaniyê nehatibû dîtin

Habîl û Kabîl

Hîna birayên şêrîn bûn

Gotinên ji rimiya agirê Zerdeşt xwedî biryar bû

Hîna Nemrûd li Berhîm nehatibû xezebê

Û ez

Bi evîneke şîbaq kirî

Li ber tevna jiyane rûniştim

Melodiyên jiyane lorandin

IV/

Mistek ax bi ser çavkaniya reşbîniyê de direşandin
Misk û ambera ji tava rojê para xwe ne standî
Li ber pozê mirovaniyê difûriya
Û ez bi her sê danê rojê re digiriyam

Bi bêrî kirineke mezin ya hesretê
Û bi hes jê kirina mirovekî
Min bi çiyarêzên di nava dilsoziya kelogirî de
Peymanek li ser azadî û serfiraziyê îmza kir

Weke qolinceke têr tevzînok
Bi ser şevê de meşiyam
Ji bo nexşeya coğrafya talankirî saz bikim
Û biskên keziyên hine kirî car din dîlanê bigirin

Min kevnarî hilweşand û evîn parast

STRANA ÇIYAN

Qijle rabûne ser piyan
Car din
Di reşa şevê de dil hate xencer kirin
Hesret di reşka çavan de rûnişt
Hêstir û hilêlkên kanika çavan kete mista destan
Rê dirêj bûn
Xewnên perçiqî dest pê kirin
Gotinên dizî û veşartî rijyan
Ken û girî tevî hev bûn
Ken di nava valahiyeke mezin de qedexe bû
Gotin mîna qolinceke dijwar bûne bargiranî
Gurê Boz ji rekihê derket
Zuriya
Erd û ezman lerizîn
Stêrikên di nava basimbarê de mezin bûyî weşiyar
Û xiyaretê destên xwe dirêj kir
Bircikên dilê min hêrivîn
Di mêjiyê min de zîndan
Di dilê min de dîlbûn
Di reşka çavên min de tîlên dirrihî çikandin

Havîna di nava germahiya dijwar de semitî
Serpêhatiyên salên gonê ku bi hesreteke mezin
Şikestî
Tî û birçî
Tewifî ne
Pêşîra xwe çirandin
Xwe înkâr kirin
Car din ji bin potîn û palêtên Roma Reş xelas ne bûn

Qijle rabûne ser piyan
Mirinê dest bi lîstîka cirîdê kir

Qijle rabûne ser piyan
Ji bo êrîşê bibin ser rojê
Stêrikên dilan bêzar û perîşan bikin
Car din
Kulîlkan hêstir barandin
Û tevna nîvrê mayî
Û evîn
Û neqşên hevrişmî
Helbesta yekîtiyê nivîsin
Konên koçerî bar kirin
Wêranî
Sotî kirin li ser dilê jiyane rûnişt
Mîrin
Bexîlî
Bi dengê sîrena qijlê re fûriya
Generalekî qamçî hejand
Poşîna xwe li erdê da
Mirina renga argûnî xuya kir
Û hat
Ez reviyam
Evîn reviya
Hawar reviya

Rojên bi tenê
Helbestan navê bêzariyê diqîriyan
Pênûs dipûnişîn
Navê welatê min ji bîr kiribûn
Navê min
Çirîskên dil
Hejariya min ne dîtîn
Cîhaneke ker û lal
Û zarokên kuştî
Helepçe
Bagok
Çar hezar gundên sotî kirî
Eleqemşê
Û banga min
Hêstirê dayikan ne dîtîn
Û generalek
Bi ser şîna zarokan de pêl dibû
Û tîmekî taybet
Bi ser kezîkûra min de hêr-hêr dikir

Şev şikestî
Evîn birîndar
Cihan di nava xwînê de xeniqî
Mayin diteqiyân
Top û tenq diteqiyân
General dikeniya
Tîmê taybet dikeniya

Navê derewê mezin dibû
Mîna banga sala gonê
Tofana 1928 an
Eleqemşê hîna digirî
Waweylê
Tirsa bi ava Çemê Xabûrê şîştî
Mirin
Û birçîbûn
Di nava hev de dixeniqî

Qijle rabûne ser piyan
Çûkên birîndar
Karxezalên kuştî
Erd û axa sêwî
Û stêrikên bizdihayî
Û ava xenîqoyî
Bi hev re direviyan
Zembereka saetê şikest
Dem rawestiya
Welatê min
Li ser zarokên kuştî digiriya
Çek diteqiyân
Top diweliyan
Meterilyoz dililiyan
Û balafiran bombe dibarandin
Toz û dumanekê zer î xenîqoyî direşandin
Qijle rabûne ser piyan
Ji apoletên general xwîn diniqutî
Nefer
Caşîkên di nava coxrafya dilê iledarî de rûniştî
Û barûd
Fişek û tîmên taybet
Bi hev re dimeşiyân

Min
Û helbesta bi darbestan re dihate nivîsandin navê aşîtiyê diqîriya

Rê hatin girtin
Pêpelûka dergehê rojê şikandin
Aşîfî birîndar bû
Şev xeniqî
Heyv koçber bû

Gorîstan mezin dibûn
Ji bo haveynê nûjeniyekê
Xortên simbêl sosinî
Pêşî gotinên di kîsikê hevrîşmî de rêz kirin
Piştî reşka çavan di nava gulbarîneke evînî de pêçan
Bi dilsoziya sund xwarî
Û nişîmanperweriyeke mezin
Hemberî qijlê
Hemberî generalê kîndar
Û Caşikên firotî
Û hemberî kîndariya tîmên taybet
Ji bo rojê di nava rengê evînê de rûnîn
Bi dilekî tîr keserî
Hemberî çîyan
Ji bo salveger û pîrozbahiyeke nû
Ku di salnameya Kurdistanê de bi cih bikin
Ji nûjen de dest bi stranan kirin

ROJ BAŞ

Roj bang dike
Ewrên gazinokî evînê dibarînin
Û Dicle
Keliha Zêrzewanê
Birîna bê derman
Û hesreta dilê hevalên min
Û çiya roj baş
Li Newala Hindiluwê
Çûkên heft rengî dileyizin
Û teyrên li serê kopirê bilind
Ku bi Feqiye Teyran, çûkê çil ziman re
Awira xwe bi ser xizaniyê de dişikînin
Dîlokên kevnariyê dilorînin
Ax dilerize
Bêhtir ji her dem xwîn û av di nava hev de difûre
Jinebiyên kezeb şewêt dil herhilî
Zarokên di nava gevzeka fetsînokê de
Û toza sarîn di nava daw û delingên ewrê spî de
Digeriyan

Xwîn û Av
Roj baş
Û evîn
Û mêrxasî
Banga ciwanan
Ala rengîn
Asoyên ji nûjen de têne nexşe kirin
Aşîtî
Şaristanî
Û Mirovanî
Roj baş

Bîrên bê binî ku di kûraya dilê min de hatine kolan
Û nefela çar pel
Devê birîna kûr
Û destan
Û stran
Roj baş
Çêlikên di hêlîna çûkên mûr şikestî de
Li ber baranê
Û stranên Seyitxan
Ku bîstûçar saetên ne şikandî
Hesreta dil, axîna welat dilorînin
Hesreta Ehmedê Xanî
Û lele
Û kelepçeyên zingar girtî
Û zindanên bi goştê mirovan pîne kirî
Roj baş

Bi evîna cangoriyan diramim
Bi evîna Zîlan
Û agirê li ser bedenên dileyize
Delala cîhanê
Cîhana li Erbilê
Dotmama min
Û bombeyên bi bedena ciwanikan ve girêdayî
Roj baş
Rêzek ji meqamê dîwanî
Û Zembilfiroş
Ku bi av remedîlka jiyaneke nû jîndar dibe
Bi min re
Bi cîhana gewrik re
Bi azadiya dilê Memê Alan re
Û Zîna hemdemî
Û cengaweriya Qeretacîdîne îro
Roj baş
Kevnariya nezanîne
Bê miraziya xiyaneke
Li Midyadê
Li her çar aliyê Kurdistanê
Davikên xwe vedane
Ji cuda bûna reş û spî re
Roj baş

Min ji bîr ne kiriye ken
Û navnîşana kelhoşkên zarokatiya xwe
Stranên demsalên bi dar û ber xemilî
Min ji bîr ne kiriye ronbîniya çavên te
Ramûsanên li ser hinarkên rûwan
Û lêvên di nava coşa maşoqî de dilerizin
Beşûşî
Hilma germ ku ji kûraya dil derdikeve
Û girî
Di nava salnameyên birîndar de razayî
Û hesret
Û koçberî
Birîndariya bi xewnên têr hêvî hatiye derman kirin
Û dûrbûna westiyayî
Weke qolinceke têr tevzînok
Û dilçoşiya ku hîna sîtemkarî nas ne kiriye
Û ez
Û tu
Ku bi stranên Şivan Perwer
Bi lorandina Gulîstan
Nehatine ji bîr kirin
Jiyana nû
Roj baş

BI TE

Xuşka heft biran Harranî tu
Xuşka roj û heyvê
Tav û berfê
Tu ne miriye
Li cihê ku tu ketî
Pêlên avê rabûne
Barana kulîlkan
Lorandina çûkan
Û teqêna çakûçekî destik şikestî
Heft caran
Heft dangan
Û heft rengan lê dixê
Mîna borezanên li ser bircikên bedena Amedê
Hemberî bêbextî û kurmîtiya sedsala bîstan
Li ser hewqas xwîna rijihayî
Û şerê azadiyê dihorînin

Tu ne miriye delala min
Yek bizrik
Yek cot
Yek ajda
Û pişkivandin
Û darmêweyên xemilî navê te dilorînin

Xemla bejna te û çavên bi kilê siphani mequşî bûne
Geşiya li ser lêvên te ku bi rengêkî diljenî vebûye
Ku bi gotinên stranên diçirîsin
Pel bi pel narîn û xamûrî dibin
Û ferhenga parçe kirî
Alfabeya wînda bûyî
Teva bi te
Bi dilsoziya te hatin nas kirin

Rê vebûn
Xort meşîyan
Keçan xwe bi rext û çekan pêçan
Gel bi hêvî, gotin bi tayên hevrişmî
Û strana azadiyê bi hesreta sedsalan sazkar kirin
Bûka sedsala bîstûyekê di nava xemla kevnariya talankirî de
Li ser hespê rûnandin
Û govendên bi dîlok û leylanan xemilandî
Ji eniya şer anîn li meydana
Weke ramûsana di nava rûpelên dîrokê de ji bîrkirî
Bi maşoqiyeke bê hember
Bê telaq û mehra ayînxanên nezan
Danîn
Stêrik
Û kefa mista xwehdayî
Û stranên jîyanê
Rabûn
Li pey doza te meşîyan

ÇAWA JIYAN E

Navê rojekê bêje min
Navê rojekê li welatê min
Bêyî êşkence û mirin
Bêyî xwîn
Û reva ji mirinê

Navê danekî bêje min
Navê danekî li welatê min
Bêyî girî
Û dilojarê
Bêyî kotek û lêdanê

Navê nimêjekê bêje min
Nimêja li welatê min
Bêyî hawar û hêvî
Bêyî lêvên lerizî
Û hestên şikestî

Navê qewlekî bêje min
Qewlên olên li welatê min
Bêyî qîr û gazin
Bêyî lorandin
Û tewirandina fetsînokî

Navê mirovekî bêje min
Mirovên li welatê min
Bêyî keşûna şermezarî
Bêyî dilzarî
Û awira qurifandî

Navê cejnekê bêje min
Cejna li welatê min
Bêyî şîn û girî
Bêyî sintaq
Û pelixî derbas bûye

Navê demekê bêje min
Bêyî ku çar demsalên welatê min
Di ber şîbaqa top û tanqan de
Bombardumana balafiran de
Li çarmixê ketiye

Navê gorîstanekê bêje min
Ku kêlên wan nehatine şikandin
Xewn û xeyalên wan nehatiye revandin
Ku gorên welatê min bêyî tirsê hatine kolan
Miriye min bêyî revê hatine veşartin

Û hesret û dil
Û evîn û zarok
Û jin û jiyan
Û axa di nava tenêbûnê de
Di bin piyan de maye

SEDSALA BÎSTÛYEKÊ

I/

Navê cejnekê dibêjin
Her roj, bi ewrên barkirî re tê
Li ser şînxaliya ronahiyê
Mirinê parve dike
Dengê bayekî tê
Û cewherê li ser dilekî birîndar
Piştî xêlî û berbûliyê bûka sedsala bîstan
Şîraniya sersibehiya azadiyê
Li ser mitikê çiyarêzên welatê min dibarîne
Pêşî Helepçe dişewite
Piştî çiyayên welatê min dibin bombardumanê de dikûrkusîne
Çîra heft cejnan
Findika heft dawetan dîtêfîne
Dîlaneke piştî sersibehiya bûkê
Ku bi dilgermiyê germ û gûr
Li ber siya ala çikandî lidarxistiye dikuje
Tovê sedsalê dilerize
Katik
Û şitlên jiyane diqurmiçin
Nan û ked
Dibin zordestiya neqam de diferfite
Û mirov
Maske dideynine ser rûdêna xwe
Korî
Kerrî
Derew
Xap û rîp
Li nav ser û guhên hev dikevin
Û xiyane
Û destên bazirgan
Bi hev re şermezariyê dibarînin

II/

Navê cejnekê dibêjin
Navê konekî koçerî
Bi alên rengîn xemle kirî distrênin
Navê daweteke demsalê dibêjin
Û karwanên destanî
Bi saz û zemheriya welatê min barkirî
Û tevna rengîn ku zembelîkên qeşayê jê dibarin
Bi kanîkên zarokan girêdayî
Bi lîstika holê nijinandî
Û heykelê Dîlzarê kurxal
Feyzî û Newila birazî
Lokman û Nayifê kurap
Cîhana dotmam
Şêzad û Azadê hemwelatî
Li serê mitikê çiyarêzan rakin şipê
Di kolanên bajaran de
Ji bo dilên mismit bûne, weliya ne
Stranên azadiyê bilorînin
Di nava mehên nîsanê de xemilî
Ku wê di sedsala bîstûyekê de
Jiyaneke nû
Welatekî nû
Bi hunandina romanî
Bête saz kirin

KUŞTIYÊN DI NAVA RENGÊN ROJÊ DE

Bû xwîn
Bû xwelî
Şev û rojên salê tenê man

Midyard evîna min, tu çiqasî bêzar
û bêmecalî

Xemla te di nava rojê de
Bi sedsala wêranî re
Ku tovê xiyaretê hatiye reşandin
Dused sal in paqij nabûye
-Evîneke reben
Dibin lingên suwariyan de dîlzar bûye
Wilo şermezar, dibin şûrê xiyaretê de
Di nava rebeniyeke kevneperestî de dinale

Dîlzar,
Xortê delal, li ser dilê dayika xwe şêrîn
Were li ber kaba helbesta min rûne
Guhdariya tofana piştî roja gonê bike
Bombe teqiyar
Tozên xumamî hatin reşandin
Û xiyaret li Midyardê mezin bû
Koçberî
Belengazî
Û xizaniya gundan
Kolanên bajarê zêde bû
Jiyan bi kêr û saturan parçe parçe kirin
Parçe kirin navê ciwamêriyê û kuştin
Palevaniyên di nava tîrêjên rojê de şewitandin
Kelih û bircikên dilê bajarê dîrokî wêran kirin

Dîlzar,
Şewlê navbera Midyad û Kerşafê
Bûye Nafûr û Kafûra tenq û topan
Bi ser zarok û zêçan de dixurrin
Gund di nava mij û moranê de winda bûne

Yek bi yek mêrxasên welatê min neqandin û kuştin
Elîkê Segvan li riya Kercosê
Mehmudê Deywanî raserî Kerboran kuştin
Û Silêmanê Ernasî eşkere, hemberî komên xelkê
Û laşên bê serî di riyana de rêz kirin
Laşê Babekir di şikefte de dîtin
Û Neyhat hîna winda ye
Û xiyanet hîna pesnê xwe dide
Mirov hîna bi navê pelesînga ciwamêriyê bangî xwe dikir
Namus bûye xelek û li duve kûçikan hatiye pêçan

Di girtîgehê de êşkence
Li gundan sintaq
Li bajarana oxilme çêdibe
Ax dirize
Gotin pûç dibe
Û ronahiya çavan dişike

Dîlzar,
Ev çî tofan e
Ku li ser kenê bi wate tê nivîsandin û dilorîne
Ku min bi kef û kinca hêrsî dihejîne
Her roj li kîlometreyên xortaniyê
Mirovan li çarmixê didin
Bûkaniya bê miraz li çardaran dikin
Bê xwedî dihêlin
Bê terqên, bê ayîna ola îslamî vedişêrin
Û hîna kes
Kesên ku bi navê tacîdariyê bangî xwe dikin
Li ber tava heyvê çavan dimelisînin
Dilwêranim ku hîna
Navê ciwamêriyê, di nava maqultiyeke bê hember de li xwe dikin

Ev çi xislet e
Êv çi hesret e
Ev çi evîn e
Ku stêrika sibehê korîk bûye
Şevên di nava helbest û stranan de xemilî
Bi kevirên Qatoro û Halêlûya melfonoyên demê
Li ezmanê Midyadê na çirisînin
Li min dayê ku hîna
Hîna bendeyî buxureke bazirganî ne
Ku mêr xwe vedişêrin
Keç û dotên wan diçine palevaniyê
Xurcezîna şermezariyê dadigirin
Her roj şer derdikeve
Dîlzar
Her rojên di hejmarê de bûne şikêr
Şerê bi jiyana mirovan mikewniyê dike
Bo ala destên te nekeve
Û sunda te li erdê ne mîne
Bo xwîn
Û axêna birîndariya te
Li mesîl û newalan bêxwedî ne mîne

Dîlzar
Navê li ber dilê welatê xwe şêrîn
Çarmixên li banê bêrmê
Û dîroka li taqê mala Enwerko
Dara tuwa hemberî Sara Hikumeta Osmanîyan
Wê bête hilweşandin
Hevalên te li hev gihane hev
Civîna xwe li ser per û baskên ewran çêkirin
Pênûsa xwe di ava okyanusa jiyane dakirin
Li ser pelên dîrokê nivîsîn
Û gotin
Peykerê Dîlzar
Wê li ser banê bêrma Midyadê
Di cihê sêdara şenqirina Elîkê Batê
Raserî riya ber bi dîroka mîrekên Cîzîra Botan
Li ser sê taqên dilan rakin şipê

II/

Bi hezaran sal e
Bi hezaran darbest
Bi hazaran laşên çarmix kirî
Li pey doza te rêz bûne
Hêvî dihilgirtin
Di nava tirseke diljenî de dimeşyan
Davik û kemîn teva dizanîbûn
Nifş hatin û ji bo pêşerojan meya azadiyê vedixwarin
Kuştîyên di gorîstanan de bê kêl mayî didîtin
Winda ne dikirin hêviyên xwe
Û dem dikirin palika kozik û çeperên xwe
Şiltaqî dikete hemberî wan
Xencera xiyaneî li movikên pişta wan diket
Tenê
Birçî
Westiyayî

Berfa di nava bayê kûr de pêçayî
Seqema bi zemheriyê hatî şîştin
Li koklîka xwe dikirin û dimeşyan
Dîlzar, şêrînê dayika xwe
Timalê xortê Midyadê
Ku hevrişmê bûkaniya welatê xwe
Li xwe pêça
Bêyî dilsariyekê berê xwe da şerê azadiyê
Destên xwe dirêjî stêrikan kir
Û kenîya
Di nava bawerîya gava yekem de gotina dawî got
-Ala azadiyê nema dikeve erdê
Û got
Serfiraziya me di vir de ye
Pirtûk, coş, zanistî bi hev re
Helbest, pexşan û bilbizêkên salê
Û stranên Miradê Kinê pê re
Navê asûmanê Kurdistanê
Ku çend sal in bêxwedî mane
Wê bêjin

Çiya
Deşt
Û newalên di nava mij û morana demsalan de
Tenê, mêşmirî, bi tirs dijiyan
Nema gazinokî dilorin
Dewlemendiyên talankirî
Rezên ne kesixandî
Û simaqa rezê Kenêra li ber têkçûnê ne
Ber dibarin
Toz dibare
Kafûra mezin difûre
Darê çarmixê careke din lidarxistin
Li her kîlometreya Kurdistanê
Laşek û sêdareke bê çiqî
Hemberî qesra bê bircik danîne
Ku bi axê, bi kevir û heste pêçaye
Û em bendeyî buxura dîlana rojê ne
Dema daholê lê da emê soza xwe bînin cih
Bê sê awazan
Bi sê stranan
Bi sê motîfên hemdemî
Emê peykerê te deynin
Emê bêjin
Emê bêjin ku Dîlzar
Emê bêjin ku hevalên dem û dewranên ronahiyê
Pişta celladê demê li erdê dan

III/

Hezar salî bêjin
Sunda emanê li canê xwe bidin
Hezar salî tobe bikin
Û bêjin me destdirêjî li ewran
Li stêrikên asûmanê Kurdistanê ne kiriye
Bizir û rengê kulîlkên erd û zeviyên dora Midyadê
Zift û axzerka dora Batmanê talan ne kiriye
Dîlzar
Wê êrîş bikin bi hezaran deng
Wê êrîş bikin bi hezaran dayik
Bi hazaran awaz wê ling bidin erdê
Ku hezar bexişandin bête dayin
Îlan kirina fermana tolhildana xwîna rijihayî
Ferşên li ser dilê xort û dotan danîne
Nayên ji bîr kirin
Dîlzar
Sersibihiya şivanan
Xemla bûkaniya stranên nehatine gotin
Û zarokên çavtirsandî
Ahên û xizanî
Namîne ji kesî re
Rima **Rustemî** Zal
Çakûçê **Kawayê** Hesinker
Careke din wê li ser kezeba xiyaretê rûne
Û bêyî diljeniyêke tirsonek wê
Li ser kevirên welatê min
Li ser per û baskên şevên têr nalênî
Li ser tûrêjên ronahiya rojê
Navê te binivîsin

GUHERTIN

Her tişt hate guhertin
Serpêhatî û bîranîn
Baranên sersibihya dereng mayî
Û kevnariya jiyane
Bûne xelatên di nava xeftanê
Çîrok û çîvanokan de pêçayî

Mirin jî têrê nake
Êş û elemên têr tevzînok
Kefikên mîzêna bazirganiyê
Xwîne ranagirin
Dost hatine guhertin
Evîn bi regekî din bang dîke

Gotin hatine guhertin
Helbest û stranên ku bar û xemginî
Di yek cemikê xurcezîne de bi cî bûne
Silaveke bi kêr û xencerê birîndar
Awireke dijwar
Ku di nava dîlzariya demê de şewitî
Teva hatine guhertin

Tenê ne ez
Tenê ne evîn
Tenê ne tu û bayê li kolanên bajaran difîqê
Her sê danên di nava gilûgazinan de perpitî
Melûl
Jiyana bi arzaniyeke sivik hatiye firotin
Hatine guhertin

Tenê ne çiya
Tenê ne jin
Tenê ne newal û mesîlên welatê min
Ba û bager
Kulîlk û çivîkên di jiyana rojê de
Di nava metroziyên têr yarî de dileyizin
Teva hatine guhertin

Ronahiyê di reşîka çavan de hêlîna xwe çêkiriye
Hemberî reşariyê diçirisîne
Mêrxasî di kevçika dil de rûniştiye
Lewra têlên tembûra evîna şikestî û tirs
Çîrokên di qulûqewêrên şevên zivistanî de
Ode û civatên feodalî teva hatin ji bîr kirin

Felesefa Arîsto, bîrdozên fizîk û kîmya hemdemî
Û rengvedana gotinên Homeros teva
Banga Rastemî Zal
Dîwana Zerdeştê kal
Teva bi maneyeke din têne gotin

Evîn careke din serket
Careke din bi teqîna tivingê re
Bi dengê gotinekê
Bi tingêniya têlekê re
Û şev teqiya
Û roj teqiya
Dil û mêjî teqiya
Her tişt hate guhertin

DIL ZÎZ BÛ

Çiyayên di nava şînê de
Ber bi rojên gazinokî d beziyan
Şev perçiqî
Reş di nava hêrsê de
Û haveyn di nava tirseke bêkewn de
Tirsonêk
Dudilî
Mirin parek ji min dibir
Û stêrikek
Rastî kete nava pêtên agir
Şev pelixî
Roj birîndar d bû
Şagirtiyên aşîtiyê û kevokên spî
Mûr şikestî li ser pelê ewran digeriyan
Ceng mezin bû
Dil zîz bû
Û bircikên kelihên heft rengî dihêrivtin
Goristan mezin bûn

HEYDÊNÎ

Ez li gorekê digeriyam
Welatek derkete hemberî min
Min xwest helbestekê binivîsim
Gotin bûne kêl
Stranek li ser lêvên min peyda bû
Ziman derizî
Çav terifîn
Şîna sedsalan dîlan girt
Û ez
Û dilê birindar
Bi zimanê derizî re
Di nava heydênîyekê de
Li goristanên winda d geriyam

PIRS

Min ji dil pîrsek kir
Min ji xwe pîrsek kir
Gulebax kanî
Got: Goristan vaye

Min ji goristanê pîrsek kir
Min ji şevê pîrsek kir
Cangorî kiye
Got: Stêrik vaye

Min ji asûmanan pîrsek kir
Min ji okyanusan pîrsek kir
Gulistan kanî
Got: Dilojarê vaye

Min ji erdê pîrsek kir
Min ji ewran pîrsek kir
Leylan kanî
Got: Hevrîşmê dil vaye

Min ji ramûsanê pîrsek kir
Min ji evînê pîrsek kir
Gulîsor kanî
Got: Cewher vaye

Min ji stranê pîrsek kir
Min ji helbestê pîrsek kir
Welat kanî
Got: Çarmix vaye

Min ji Baz pîrsek kir
Min ji ba pîrsek kir
Aştî kanî
Got: Zincîr û lele vaye

GULVEDAN

Helbesta min di nava sirrekî mezin de
Êşa xwe diqîre
Gotinên min bi coşeke germ û kûr
Birinên xwe dihejmêrin
Niyazek ji nava ayînên sedsalan derket
Mîrineke bê wext
Di nava arzuhalekê de
Ji nişkê ve
Bi hunerekî bizdonek
Ber bi min û yara ling xirxalî beziya
Û bejna zirav
Bi xemla heft sedsalan xemilî
Di goristana bê nav de
Derkete hemberî min û yara min
Fanosên dilan di destan de geriyan
Ber bi çavkaniyên hêviya argûnî beziyan
Kenîyan
Li asoyên rojhilat xalî cewher vedan
Mezin bû
Geş bû
Û dengêkî cawîdanî hildêran
Gotin:
Li Asya
Li Hind-û Ewropa
Gulvedan in em

NAVEROK

- Strana nêvre 7*
Zîlan 15
Evîna te xelatek da min 26
Nayîf nayîf 28
Her tiştî bi evînekê dest pê kir 38
Kulîlka azadiyê 41
Agir 45
Dîlana azadiyê 56
Soza me hebû 59
Stranên jiyane 61
Buka welatê min 63
Bi min re 66
Xwîna li ber diwar 67
Sedsala tewanbar 69
Gulîsor 71
Şev û roj 72
Çend salin 73
Nijdevanên welatê min 74
Xemla azadiyê 75
Navê helbesta min 79
Evîna min 80
Strana jiyane 85
Roj baş 89
Bi te 92
Çawa jiyane 94
Sedsala bistûyekê 96
Kuştiyên di nava rengên rojêde 98
Guhertin 104
Dil zîz bû 106
Heydenî 107
Pirs 108
Gûlvedan 109

Sîrûşek gihiştî di helbestan de, diyar dibe ku M. Ferho sawîra xwe ya bi bazik fereh û bilind berdide esûmanê welat. Mirov û şoreşê, sêgûşeyê ku helbestê berevokê bi giştî xwe li ser radiperînî û ava dikin.

Stranên xelex hesinî/wilo stuxwar di dilê gomê de dilorînî / Mija perdeyî li ser çavan / Tê û vedigere ser stana Kurdistanê / Dibe tevnepîrka polayî / Dibe rekiha mêjî / Xewrebezê mêran dihelîne... (...) Di navenda dilê pûçş de / Û wan tîrbên bê kêl / Bê nav / Ji Serhedê bi jêrî / Heya bi Beriya Xelef Axa/Dilop bi dilop / Damsitonka xwînê...

Bêguman bi van çend bendikên mînak, em li hemberî bejneke şeng û pêûsek dilewer û ramanek hemdemî radiwestin. Lê carcaran, helbestên berevokê di hûmîna xwe yî azad û nûjîn de kevin pêşeyî yek xuya dike. (...) Di dema ku her du helbestên (...) wek du mînan, bi awayekî spehî, gewre hest dibin. Hem di şehîna muzîk û rîtmî xwe ya dûzena hundirîn de... Ango, gotin û deng û awaz xwe vedirîsnîn, ji şêwa pêşeyî... Herwekî hozan awayê hêsaniya dijwar di helbestên komela xwe de pêktîne, di bijartin û li hev suwar kirina peyv û hevokan de, ta, carcaran, bendikên stran û peyvokên gelerî yê fîklorîk bikar tîne.

Lewra navenda afrînî ya di xuyaniya mamikê de bi zanistî û armanc, carcaran, tê hebûnê dibe (..) Lê wek wan pîvanên afrînî yê dihejîqin di navbera durf û sembolyê de ji alîkî ve û axaftin û bengên rasterast, ji aliyê din ve di helbesta (..) -n- de heye.

.....

Bi rastî M.Ferho bi vê pirtûka xwe hêviyek mezin daye. Mizgîniyek dilşahî ye ku çanda kurdî di her hêlî de ber bi dewlemendiya diçe. Da ku em teva li M.Ferho guhdarî bikin,

..... / Bêdengî, dijiminê jiyane ye / Bêdengî / Tovê waweyê / Û kêla di binê avê de ye.

Kerîm BAQISTANÎ
Asoyên Sîrûş û Sawîra Hozanî
agahdarî, Nîsan 1996